# Şevên sar

**Roman**

**Hesen Îbrahîm**

**(1)**

**Gond yê didanga çîyayekê birisî û rüt da nivisitî.**

**Pitir jibîst mala dikawdanekê giranda dijîn.**

**Xanyên wan jiaxê û püşî dirust kirîne.Ne kahreb û ne rê ü rêbarin.Ne xwandingeh ü mizkefte.**

**Çu rübar ü kanî rüyê gundî geş nakin.Warekê hişik û bê dar ü bar ü şînkatîye.**

**Hemü yên li hîvîya mirinê..Yan rüdaneka mezin.Da kulkên wan yên nîv herftî,bikite qesirên helankirî.**

**Çend bihusteka jigondî wêve kanyên gazê biser erdî dikevin, lê nihu gondî hemüyê tijî fanosekê gaz têda nîne..!**

**Şivanê gundî yê biçavekîye,gavan yê seqete.**

**Jigundî hemüyê,dûsê mal biçükên xwe dihinêrine xwandinê libajêrê....!**

**Karê gundîya,mirêbatîya axayekê bê dile,çend mistên genimê havînê kum kirîn,dikine savar,lizivistanê liber supa dara dixon.**

**Hîvyên hemüya stewrin,kes xema paşerojê naxot.destê kesê nagehite dergehên Mirada,bêkarîyê hemü yên xesandîn, dür jibajêrî,dür jicihên jiyanê,dür jiavedanîyê,hemü yên wek peykera hişik kirîn..**

**Dîtina bajêrî,bû geleka Mirade,xwandin bû hemüyan xewne.hêşta kesê jigundîya berê beytê maç nekirî ye.hêşta dengê para jipaxla kesê nehatîye..**

**Turmbêl her çend heyveka nesaxekî,yan polîsekî dînte gondî..**

**Hemü yên lihîvîya rojê da niqon bit û lidûr sopeka gerim guhdarîya mîrzu bikin.Ne hay jidinîyayê mayne,ne mayê xwe diramîyaryê dikin,ne ayatên pîroz jiberdikin,ne pertuk ü rojnama dixwînin..**

**Tinê hemü dizanin,ka şivêdî mîrzu çîroka xwe likîş beytê bidawî înaye.!**

**- hebû,nebû,kes jixudê mazintir nebû,kes jibenîya direwtir nebû..**

**Em şivêdî gehiştbüne..**

**Deh denga pêkve gutin:**

**— em gehiştbün,demê çavê memê alan bizîna zêdan ketî dipencera qesirêda..**

**Mîrzu dûsê cara cihê xwe xweş kir,ewên lirex ü rûya.xwe jihemüya bibext tir didîtin,Balîfik diheşandine diber teniştên wî ra û mîrzu vêra çû...**

**– kes nizanit,husin ü cemala zînê heta çi rade ye?!**

**Heyiv şerim jixwe dikit,roj jiber şewqa wê xwe vedişêrt....!**

**Her wekü gundîya murikên xewê danayine ser sîngê xwe.**

**Biçük didangên dayikên xweda dixew cûn.tulaz man mendehuş.herêkü xwe didît mem û yara xwe didît zîn..**

**Hemü wek peykera man bê gîyan,çavên wan yên lidevê mîrzuy,ka dê çi ayatên pîroz jê derkevit?**

**Karu berx man ne mêtî.ker û dewar man bê Alif.rüvî ketin kolkên mirîşka,pişîka mast jibin pata înane der.dinîya xirab bit,bü kesê ne xeme,tinê çi peyv,çi livînên mîrzu jikesê ne çin..!**

**Mîrzu yê biherdû desta livîn û xebatê dikit,bînerên xwe bi banê peyvên xwe ve hêlan hilawîstî.hemü yên büyne êxsîrên peyvên wî..**

**Sipêdê rabûn,çend bihusteka befir ya barî...!**

**(2)**

**Liwê hola mezin û pirî mirov,digel Mamustayên xwe yê rawestîyaye..**

**Çend xwendikarên zankwyê yên bü desta diqutin.**

**Serukê zankwyê,destê xwe dana ser milî û bidengekê bilind gût:**

**— em jidil pîrozbahîya xoe û ya vî xwendikarê zîrek û serketî dikin.ew serkêşê zanist û meirîfetêye lizankûya me.hîvîdarim hün hemü wek wî diserketî û xudan şîyanên zanisitî bin..**

**Bidestê dî bawernama serketinê kire didesitî da...**

**Hol tijî dest qutan ü keyif bû.devê yara wî na kevite serêk jikeyfa.**

**Ha ha dê xwe jikuma mirova havête dinav sîngê wî da....!**

*******

**Destê xwe limilî da**

**– divêt tû vê hola mezin hemüyê baş bimalî,ü van şîşên pencera jî hemüyan baş paqij bikî,hemü mêza pate bidî,û van xwelîdanka bişoy,ü cihê destavê baş paqij bikî.Heta ez bizifirim,divêt te ev kare hemü kiribin,heker tû kure bibî,êk filsî nabînî....!**

**Bişkurîn hêşta liser lêvên wî ma bû,lê demê ew gêzik û hindek alavên paqijkirinê kirîne didesitîda,rengê mirîya girt**

**(3)**

**– helo,tû çewanî? Başî?**

**– gelek başim,hûn çewanin?**

**– em hemü dibaşin,pirsîyara halê te dikin?**

**— dayika min?Babê min?Rewşa wan çewaye?**

**— tû çi dikî?Ma tû naêye seredana me?**

**— min gût dayik ü babên min diçewane?**

**— ê,..niza..Niza çi bêjim?!**

**— çi bûye?Dîyare dinesaxin..?**

**— berî şeş heva,herdû ne mayne...!**

**(4)**

**Bajêr yê berfireh û bê dawîye.gelek jixelkê wî,hêşta dawîya wî nedîtîye.**

**Wek biçükekê sava dikuşa dayika xweda yê nivîsitîye,kes bawer nakit ku ev bajêre tijî mirove!**

**Êkşemb,roja bêhn vedanêye.kes çu kara nakit,hemü yên dixeweka giranda,dikoşên yarên xwe da nivîsitîne.**

**Livîn jiçu gîyanewera naêt,baran nabart,kutir nafirin,se na rewin..**
**tinê ew yê hişîyare,wê berê sipêdê,wek her roj.xwe rapêçaye ü kulanên bajêrî bihust bihust dipîvit!**

**— eve çî ye? Ka mirovên vî bajêrî?Kîve xwe veşartîne?Nê dûhî bû livan kulana cih nebû jimirova?**

**Kesê bersiva wî ne dida,tinê dengê xudanê karî ser lê diwermand..!**

**— subehî ez te liser karî ne bînim..**

**- tû ne zelamê karî..Tinê karê te nivîstin ü xwarine,wek sey..**

**Serê xwe dihejand û didilê xweda digirîya,car jî girîya wî dibü bişkurîn,demê hizra dibire rojên zankwyê..**

**– em hemü bite diser ferazin,te serê me bilind kir,tû dê bîye şemalikeka geş dirêya hevalên xwe da..!**

**Carekadî dengê xudanê karî ew hizir belav dikirin..**

**— Çu cîyawazî dinavbera te û ya seyekê pîr da nîne..!Tinê nave,ne ne,se gelek jite baştire.se çu xirabîya nakit.Tû berazî, beraz..**

*******

**— Her tiştê te divêt...Her cihê te divêt.. .Em dê bote amade kin.dê hemü daxwazyên te bicih înin,da tû bidiristî karê xwe bikî..**

**Welat,millet pêtivî kesên wek teye!**

*******

**— subehî ne êye karî.. Ez te livara nebînim..!**

*******

**Şev biserda hat,carekadî liwê jora bû wî bûye gor veheiya..**

**Lê ma dê çewa hedara wî êt?Ne kare,ne paşeroj.**

**ne hevalin,ne kes û karin..**

**Dest da qelem ü kaxeza,neşîya çu binivêst,wan kitêbên jigîyanê xwe xuştir divîyan,liber çavên wî bibün düpşik, telefizîwn neyarê wîye,telefunê babê wî dayika wî herdû kuştîne..!**

**Lihêf ü balîfk,goristaneka tarîne,tinê,tinê sebra wî ü hevala wî,ew şîşa votkayê ye.Gelek cara pêkve diçine gerîyanê û seyrana,gelek şeva heta berê sipêdê dest digerdena êk diwerînin..!**

**Tinê ew votkaye,wî dibite beramberî xudana pirça dirêj, tinê ew votkaye wî dikite mêvanê wan her dû çavên mê, tinê ewe,wî heta berê sipêdê liser sîngê wê dinivînit wek biçükekê sava,tinê ew votkaye tinê ewe...!**

**(5)**

**- Helo.. Roj baş**

**- roj baş, keremke?**

**- Ezim.. Ez azadim..**

**- Belê kak azad keremke?**

**- Tû çewanî? Başî?**

**- Supas,em dibaşin.Keremke te karek,xizmetek heye?**

**- Tinê min divîya goh lidengê te bigirim.**

**- bibüre,zelamê min limal nîne.Tû dişêy telefuna wî liser karî bikî.**

**- Ne ne,min divîya digel te baxivim..Goh likenîya te bigirim.**

**- Bilê?!Te çi gût?!**

**- Çine,hema baxive,bikene,behsê xwe bike.**

**- Bibüre,ez dimerema te negehiştim?!**

**- Te ageh jimin nîne!Çu nemaye ez dê har ü dîn bim..**

**- Jiber çi dê har û dîn bî?!**

**- Jiber te..!**

**- Jiber min?!**

**- Erê jiber te..Jiber çavên te..Jiber pirça te..Jiber kenîya te..**

**- Raweste,raweste..!Dîyare te tiştek vexwarîye?Te ageh jixwe nîne.ma tû nizanî ez ya bimêrim û xudan biçükim?!**

**- eve hemü bû min ne xemin.Tinê xema min,tû bü min hindek bikenî,da dilê min tena bit..!**

**- ez bawerim tû ne yê dirustî!**

**- te rast gût,ez evîndarekê haru dînim.Bişev tû nahêlî ez binivim..Bi roj tû jipêş çavên min naçî..!**

**Kenîyeka ter tijî mejiyê wî bû,hemü endamên leşê wî nêr kirin.ew destê dinav pêsîra wî da har bû,berî telefonê danit, gîyanê wî jidil tena bû.**

**Qesta serşoyê kir.Wê şevê gelek tena nivîst...**

**Sipêdê zü dest da telefonê û careka dî xodana pirçê jixewa şirîn hişîyar kir.**

**Eve bû karê wî.heval jibîr kirin,mala xwe jibîr kir.**

**lişolî negerîya,xew nema,tinê ma lihîvîya delîvekê,heta zelamê wê jimal biçite derê,da ew qesta telefonê bikit.Da gîyanê xwe bû demekî têr bikit,da xemên xwe bû çend çirkeyeka ser jê bikit!**

**Ew telefon dibü alifê gîyanê wî,leşê wî dişîya pê bijît,jiyana wî bidûmînit.**

**Lê dîtina wê bibü xewin,hîvî.çu tişt neman xebatê bü bikit, tinê dîtina wê.rawestîyan libersîngê wê,hemü xebata wî ye!**

**(6)**

**Liser depê dîskûyê,wek meymünka dinava wê heşameta mirova da,dileyîzit,liber muzîka "rock"milmlanê ü bablekan dihelînit....!**

**Ew muzîka bîyanî liber guhên wî bibü dehol ü zirna.awazên filklorî jê dibarîn.**

**Gencatîya wî dûbare dibü.Ew tinê serkêşê dîlanêye,çend kiçên gondî lewindyên xwe bü dihejînin,yara wî liber dîwarê mala xwe çafzlkanê digel dikit.lêvên xwe dinav didanên xwe da dihêrit!**

**Her dehol ü zirna dişaryêt.her govend diazirit.**

**xuha leşê wî zêde dibit,gîyan har dibit,hest nêr dibit.**

**Kitkte depê dîskûyê vala kirin,cih bü wî bitinê ma....!**

**Hemüya dest bü diqutan,lidür kum bûn..**

**Muzîk bilind bû, ew har bû,bîner zêde bûn,ew dîn bû,ronahî dileyizî,wî milên xwe kirine şema.Wek zarvekerekê şareza liser depê dîskûyê rolê xwe bidawî îna..**

**Pitir jinîva bînera hatine destê wî.ü geleka xwe dinav Sîngê wî da şidandin û divîyan wê şevê liber tenişta wî binivin....!**

**(7)**

**Gondî hemü yên jikevlujankê xwe derketîn.Kes nemaye linav gondî,hemü libinê kutana pezî dikumin.**

**Simko yê şivan.pez hêla dikutanê ve,ün bibilura xwe serê gondîya hêr kir.**

**Reşo yê gavan.garan hêla digova ve û teneka avê ya kirîye dehol..**

**Mîrzo biliblê gondîye,jivî çeqî diçite çeqê dî.bistiran ü lawik ü heyrana gondî hemü mendehuş ü serxweş kirîne....!**

**Çucar hosa keyiva wan nehatîye.wan gewriyên eve çend salin tilîlî jibîr kirîn,eviro bibûn pîkên zirnayê.**

**Tulazên gondî,xwe xwarin,kiça lewendiyên xwe dicûyin, pêsîrên şelên zelama vebûn.**

**Seyên gondî direwîn,pişîka çüçkên kurka jikulkî dizîn.Ker hinşerî bûn hindî xodana ceh dana ber,da bela wan jixwe vekin.**

**Dîkil ü mirîşik necone lîsî.Hemü gîyanewerd serxweşin,livê gondî.**

**Eve ne ew gondê carane!Eve ne ew gondîne...!**

**– ez êdî şivanîya gondî nakim.Dê bime zêrevanê azadî,dê digel wî çime bajêrî,hebit nebit dê bite tiştek gelek mezin....!**

**— Şivanê pîs,jipezî pêve tu bikêr çu naêy.Ezim xudê bû zêrevanîya azadî dayim.Ezim jibû xizmeta wî amade!**

**Gelekên dî didilê xweda xwe bû wî dikirine erd û geleka hîvî diçavên wî da didîtin..!**

**— Dê rêya gondî kite qîr**

**— Dê xwandingehê înite gondî**

**— Dê mizgevtê ligondî avakit.**

**Gelek kiça paxlên xwe diperxandin,xwe liber tenişta wî wek bûk didîtin.**

**Heyranuka mîrzoy,hizirên hemüya birine nik wê teneka linav koma mirova,ewa azad liser roniştî.**

**- Hey lû.... Hey lû....Lawkê gondî**

**Hey lû.. Hey lû..**

**Jibejna te tê ew bedlle ye..**

**Jinavê te tê bawer name ye..**

**Çavên kiçên gondî lirêya te ye..**

**Hey lû.. Hey lû...Lawkê gondî..**

**Demê taryê xwe biser gondî da girtî,bişkurînê gelek lêv girtin.**

**— Dê her kahrebê bû gondî înit..!**

**Hemü pêkve limala muxtarê gondî liser sifira xwarinê kum bûn.**

**Wê şevê azad bibû mêvanê xewa bahira pitir jikçên gondî..**

**Gelek jinên bimêr,wê şevê liber teniştaxwe didîtin.**

**Bû gelek tulaza bibû hîvî û mînak.**

**Wê şevê navê wî liser dû biçükên gondî kirin,wê şevê sê biçük dikuşa wî sininet kirin.wê şevê jiber xatira wî, elo ü qado pêk hatin.wê şevê heta berê sipêdê yara wî xew nedît.wê şevê fanusa mala babê wê heta nîviro ma hil.....!**

*******

**Wê şevê,wek gelek şeva,li wê meyxana wek şikevta û liwî cihê her car,ü liser wê kursîka bitinê û wê mêza biçük.her wekü bû wî dirust kirîn,ü likujiyekê tarî danayin.yê royiniştîye.**

**Rengê wî yê pêtî,berüka wî ya vala,mêza wî ya birsî.**

**Çu jin temaya xwe na bine dîwana wî.**

**Her yê bitinêye,hevala wî,dusta wî.ew şüşa votkayê ye.ewa jihemüyan erzantir.**

**Serê xwe bilind kir,meyxane pire jimirovan,liher kujiyekê wê şikevtê,cîhaneka taybete,kesê ageh jikesê nîne,her êkî ageh jiwê heye,ewa dikuşa wî da,ewa dinav destên wî da, wek gilomckeka befirê dihelyêt.**

**Tinê ew yê bê hevale,tinê ew yê lêvên xwe dixot.**

**Çavê wî bibanê meyxanê ket,hizra bire şikefta gelî.Ewa çend carekê deng jidevê tivengekê dihat,gondîya hemüya qest dikirê û têve dihatin xudan kirin.**

**Her malekê jigondîya cihê xwe hebû,lirojên nexweşîya liwan dibû stare,jiagirê şera diparastin,û jiserma zivistanê jî ne ditirsîyan.**

**Mala wan birex mala muxtarî ve bû.muxtar xodanê dû jina ü bireka biçüka ye.**

**Cihê wi bi rex mala muxtarî ve ye.jitengavîya cihî.hemü yên kirîne êk mal,gelek şeva xew jê direvî,taybet demê muxtar dinîva her dû jinên xwe da dinivîst.Linîva şevê û pêda,dibû şerê herdû jina liser sîngê muxtarî.**

**Gelek şeva çav zilkanê dikir lidemê muxtar dikelixê jina xwe ya biçük diçerî,wî jî liber gohnêlîya muxtarî leşê xwe dixwar.**

**Liberê sipêdê demê muxtarî cinabet liser xwe ra dikirin.wî jî mesînekê ava tezî lileşê xwe dikir.**

**- Te xêre mamu? Çi xudê jite standîye vê berê sipêdê û vê sermayê tu xwe helal dikî?!**

**Kenîya muxtarî tijî wî gelî dibû,bişkurînê lêvên wî jî digirtin.**

**Dengê kenîya wê jina dikuşa yarê xwe da,hizirên wî jişikevta gelî, înane wê meyxana kevnar.**

**Jin ya nîv rüse dikuşa yarê xwe da,yar her wekü pilingekê birsî berdîye dinaf qerqodê xezaleka küvî da.Ha ha dê xut, dê daürit,çu ne maye lê nekirî.**

**Ew yê dengê gohnêlîya xwe bilind dikin.**

**azad yê dikevilojankê xwe da dihelyêt.Her kenîya wê jinê mê dibit,her azad nêr dibit,her votka mejyê wî xav dikit,her deng nêzîk dibit.**

**Diwê berîkana dengê mê û leşê nêr û votka dijwar da.**

**Hest gehişte pila xwe jibîrkirinê..**

**Dest da pêsîra xwe û lipêş çavên hemüya,kirmê mêranîya xwe bidestê xwe şikand....!**

**Meyxane tijî kenî bû,hemüya bû dest qotan,û bî pêtiranik..**

**Dû zegzega milên wî girtin,jimeyxanê birineder,her êkî pêhnek lê da û jiwî cihî dûr kirin..**

*****

**Cade hind ya dirêje.binê wê ya libin bêt wî, û serê wê ya bizikê esmanî ve.**

**Esman,wek bûkeka sile,hindek ewra royê wê kirêt kirîne.**

**Belgên dara wek befira zer lêvên cadê nexşandîne, zeratîya belga rengê şevê gohartîye....!**

**Libin her çend dareka,dû evîndar yê guhnêlyê dikin.**

**Serma,polîsekê kirête,her zü hemü evîndar dakirine dijor û meyxana ve.**

**Serê wî yê tijî..Hizirên belav kirine rastî.gelek çara bişkurîna lêvên wî dibû kenî,kenîyeka bilind.**

**Demê dibû mêvanê pîrejineka têr.Piştî jirazî kirina wê xilas dibû,tijî berüka wî pare dikir û digût:**

**— Subehî zü were, bila?**

**Kenîya wî dibû hewar ü xeber,demê hindek tolaz bikenîya wî dikenîn û axivtinên kirêt digûtinê..**

**Cade hêşta yamay,şev,hêşta yamay,kesên wek wî tijî ber dîwarane.**

**Leşê wî her yê giran û bê hêz dibit,serê wî her yê sivik ü belav dibit.çavên wî her yên tarî dibin...!**

**Kuxî..Kuxka wî vê carê jiküratîya dilê wî derket.**

**Gelek kuxî,sor bû,reş bû,rengê wî pêtî bû.**

**Dema tif kirî,tameka dî jitfa wî hat.ne ew tama her car bû, lê tarîya şevê ü çavên nîv nivîsitî,rengê tifa wî jirengê şevê coda nekirin.Tama tifa wî ne ya xerîb bû,ev tame gelek cara tam kirîye.çend carekê ketîye girtîxana dojmna.çend cara jî sera wê kiça cîrana wan dibû şer ü lêkdana wî digel tolazên dî.Ew tam dikete devê wî.wê gavê ew tam liber devê wî gelek xweş bû,dizanî eve bihayê xwe ragirtinê ye. eve bihayê evînê ye,eve baca welatî ye.**

**Lê vê carê ew tam newesa xweşe.ew tam ya dil reşe.keyif pê naêt.dibit jiber vê carê ne bihayê çu welat ü çu evînaye dibit vê carê tinê sizayê mejî hişkîya wî ye. Lewra tama wê tifê ya dil reşe.Wek reşatîya şevê.wek reşatîya cadê.wek reşatîya paşeşojê.....!**

**(8)**

**— lidüf yasaya vî welatî,her kesê karekê dijî berjewendîya giştî bikit,her kesê direwa lipolîs ü karmendên hukmetê bikit, dê ête siza dan.**

**Her jiroja êkê tû hatîye vî welatî.te binavekê direw ü nasnamên direw,xwe bû me daye nîyasîn.te xwe kirîye ereb,jidevera bin destê rijêmê.**

**Piştî salekê bû me dîyar bû,eve hemü neweye.Te zankûya xwe hêla û te karê xwe hêla,û tû toşî kêşana dermanka bûy.**

**Piştî çend agehdaryên polsa û çend sizaya,te navê xwe gohart.**

**Liser van direwa hemüyan,tü divê salê da deh cara ketîye destê polîsan.**

**Pêniç cara jiber şer ü dijatîya digel xelkî.**

**sê cara jiber şolê reş.**

**dû cara jiber derçona te jiwê bazna bû te dîyar kirî..**

**Ev hemü karên ne dirêdanin.Liser te bihisabin.piştî siza para hatîye ser te,jiber wan karên tekirîn,tû careka dî demê salekê berzebûy.**

**Careka dî polîsa tû dîyar kirî binavekê dî ü bihindek nasnamên dî.**

**Te vê carê xwe kirîye fele,piştî tû cara êkê îslam bûy.**

**Tû hatîye zifirandin bû kempa berê,te dest jikarên xirab ber nedan.**

**Te dermanik firotin.te dizî kirin,te şolê reş kir,ü cara dawîyê, sê kîlogiramên hêrwynê didest te da hatin girtin....!**

**Serê wî neşîya xwe liser mila bigirt,dinîya lipêş çava zer bû.**

**Berê xwe da cihê deng jê diêt,lipêş çava bûne gelek dev. Ew xaça lihindav serê dadwerî,bü sêdare,werîsekê zifir şor dibû diketestoyê wî!**

**Hol ya biçüke,liber sîngê wî.dadwerekê sereye,lirexên wî.dû polsên reng efrîtin.lipişt wî parêzerekê bê zimane.lihindaf serê wî ziman zaneke.**

**Diwan çend çirkeyên dadwer jixwandina gonehên wî xilas bûy.serê xwe bilind kir,zanî likîveye!**

**Berê xwe da parêzerê xwe.parêzer çu nemaye dê lêvên xwe liber didanên xwe hêrt!Berê xwe da wan polîsa.polîs wek peykeranin.**

**Serê dadwerî yê dinav kaxeza ra..**

**Tinê ziman zanî bişkurîneka şermîn kire dîyarî.Lê dengê dadwerî hemü livîn serjê kirin.**

**Liser milê xwe yê rastê û yê çepê zifirî.**

**Binavê gel....Ev birîyare diderheqê te da hatin dan:**

**Tû jimafê penaberyê hatîye bê bar kirin.**

**Tû jihemü kaxez ü pênasên vî welatî hatîye bêbar kirin.**

**Demê sê salan hatîye zîndan kirin.divêt divan sê salan da di girtîxanê da bimînî.**

**Polîsa mavê zifirandina te bû welatê te heye.lê jiber destüdarê welatê te.em dê birîyara zifirandina te ragirin.**

**Parên dadê ü yên polîsa û yên ziman zanî û yên parêzezî, hemü liser tene.**

**Te hinde têbînî,yan ne razî bûn hene?!**

**Dengê dadwerî liber goha yê şêlî bû,çu denga neşîya wan hizirên diserî da bisimin,dengê Mamustayê wî bilind dibû:**

**- Tû her dê bîye kesekê navdar!**

**- Hişîyar be! Me jibîr ne....!**

**- Şîyanên te jiyên Mamustayên te pitirin!**

**Dû polîsa milên wî girtin û beref bin erdî birin.**

*******

**Destê wî yê biçük,yê didestê dayika wî da.dayik ya dibezit, dehmenên xwe hildayine binkefşên xwe. ü ew kifnê reş lidûr teniştên xwe pêçaye.biher dû mila ya xwe dinav wan mirovên tijî ber derê girtîxana "eboxirêb" diqutit.cihê xwe dinav kuma wan da dikit! çend xelkê wî welatî,eviro liber derê vê girtîxana Kirêt kum bûyine.Eve karê wane her çend heyiva carekê,diêne seredana mirovên xwe,ewên bê goneh,hatînegirtin.**

**Çu nemaye dê destê wî yê biçük jimilî ête hilkêşan.**

**Her dayika wî ya dirakêşit,her ew yê dibezit.Heta gehiştîne ber dergehê serekî.**

**Girtî hemü libenda mirovên xwe ne.Dergeh vekirin.wek berxên berdayne ber pezî.her êkî qesta mirovê xwe kir.**

**Liwî cihê gelek hîvî lê çandîn,ketin beramberî êk.**

**Çavên jixerîbîyê kil bûyin.dilê evîndar,jina pêtvî mêrê xwe.**

**Çavzlkanê kirin,destên wan wek tevnî têk hatin raçandin.**

**- Em bûte dîn ü har bûn..**

**- Ez hizar cara pitir.**

**- Kurê te pirsîyara te dikit.!**

**Serê xwe yê biçük bilind kir,çavên babê wî tijî evîn ü tijî hîvî ne!**

**- kurê min,bibüre eve min bixwe ho nekirîye!Min çu karên xirab nekirîne.Em bin destin,min xebat kirîye,şoreş kirîye..**

**Serê xwe çemand,berê xwe jibabê xwe gohast.**

**- divêt tû rastyê bû wî bêjî...Rastîya jiyana me.welatê me.**

**- ez her dibêjmê,babê te xebat kere,babê te şoreşgêre,lê ew dibêjit,min çu şoreşgêr nevên,min babê xwe divêt....!**

**- Ne ne, kurê min,jiçirîska êkê ya şoreşa eylunê,bapîrê te digelida bû,wî digût,em yên bişoreşekê radibin,ne bû meye, ü ne bû korên meye.lê dibit nevyên me berhemê wê bixon. Helbet ew şoreş ya fere..!Iha nihu tû nevyê wî,ez bawerim tû dê berhemê wê şoreşê xuy..!**

**Serê xwe dîsan bilind kir,didilê xwe da daxwaza lê bûrînê ji babê xwe dikir.devê babê wî tijî kenîye,hêşta tilên dayika wî dinav tilên babê da diveşartîne.**

**Kenî û girîya jigirtîya ü kesên wan bilind dibit,hizirên wî belav kirin.**

**Dengê polîsê mirinê,hemü tişt ser jê kirin,hizir mirin,hîvî man hilaoystî.**

**- seredan xilas!Dê her kes karê jiderve bikit,û girtî qesta zîndanên xwe bikin.Dê, dê lezê bikin..**

**Her dû cûn dane ber dar û qamçîya.wek şivana,berx û pez jêk cûda kirin..**

*****

**Şeq şeqa seqatên dergeha,kêşa cîhana rastyê,lipişt çend dergehan,lijoreka pirî mirov kire mêvan.**

**- eve cihê teye,eve jî hevalên tene..Biburin,eve hevalekê nûye bû hewe,navê wî azade,hîvîye hûn bixoşî pêkve bijîn.**

**Gelek denga bixêrhatina wî kirin,lê bû wî ya jihemüyan seyir tir,gelek deng bizimanê wî bûn....!**

**Kartêkirina birîyara dadwerî,hêşta serê wî berne daye.lê dengê babê wî biser hemü denga zal bibû.**

**- ez ne dizim,ez ne mirov kujim,ez şoreşgêrim,ez xodan welatekê bin destim,divêt tû şanazyê bimin bibî..!**

*****

**— Te dizî kirîye,te şolê reş kirîye,te direw kirîne,te dermanik kêşayne..**

*****

**Şeva êkê liwarê nû,xew sil kir,hevalên wi hemü nivîstin.ew ma hişîyar,wek zêrevana lihindav wan kelexên gelek westîyay!**

**Mêvanên vê jorê,hemü bîyanî ne,kes xelkê vî welatî nîne. Jidîwara dîyare.vê jorê gelek mêvan hewandîne.bihemü zimana nivêsîn û bîrhatin nexşandîne.Lê tinê hindek nivêsîna sernca wiî rakêşa..**

**(ax welat,bijî kurdstan,bijî ala kurdan.evîna min,dayika min. babê min)**

**Zanî gencên welatê wî toşî çi vayiros bûyine!Zanî welatê xelkê bû kesê na bit welat..!**

**Dengê mîrzoy bilind bû:**

**Hey lû, hey lû**

**Lawkê gondî..**

**Ewê birex ve,hizirên wî belav kirin:**

**— Tu bû na nivî?**

**- xewa min naêt!**

**- dê westyêy...te ne gûte me?Jiber çi tû yê girtî?Çend sala....?**

**- sê sala..Ne jiber çu..!**

**- bawer neke livî welatî mirovek bê eger bête girtin!**

**- tinê ez bê eger hatîme girtin.Jiber min ageh jixwe nîne ka ez çi dikim!**

**- Ew çewa?**

**- Belê..Min hemü tişt hêlan.jina xwe,biçükên xwe,welatê xwe,dayik ü babên xwe,û bidüv kiçeka ros ketim.**

**- ê?**

**- Wê jî texsîr nekir,ez vêrî hemü tişta kirim.dizîya,dermanik kêşanê,şera,şolê reş.û lidawîyê,ez hêlam û berize bû!**

**- Ma te çewa gohê xwe da kiçeka wesa?**

**- Jicwanîya wê min ageh jiçu nebû.tinê ew razî biba.çi biba bila biba!**

**- Û biçükên te likîve ne?**

**- Niza..Eve çend sale min ageh jikesê nîne.Ez bawerdikim yên limila birayê min.ü tû?Tû jiber çi livêrêy?**

**- Binive,binive,şev dimişe ne,em dê gelek sohbeta kin!**

**Balîvik bizotekê agirîye.lihêf kevilê jijî ye.ew textê asnî,ewê dinîva dû textên dîda,bibû Girtîxaneka dî dinav wê girtîxana kirêt da.**

**Dilê jar ü mejyê westîyay ü leşê lawaz pêtivî nivistinê ne.**

**xew bixwe bibû dojmin,ditirsîya binivit,neku ewa biserî hatî bibite rastî,nedivîya çu tişta bawer bikit!**

*******

**- tû herdê bîye mirovekê navdar**

**- te serê bine mala me bilind kir**

**- te şîyanên mezin hene**

**(hey lû, hey lû..Lawkê gondî)**

**Dehol ü zirna esmana disimt,çend xelkê gondî ü gondên dewrubera ligondê wan kum bûyine.**

**Babê wî wek tawsekê nêr,xwe qiş kirîye,biserê tilên xwe bixêrhatina mêvana dikit.her çendekê şeqênê jitizbyên xwe dînit.**

**Birayê wî ala Kurdistanê didestî da ye ü serê govendê bernadit,her çendekê destê xwe dibite paxlaxwe ü paxla zirna bêjî tijî şabaş dikit**

**Zirna bêj haha dê zirna xwe daurit!**

**Xoşkên wî,wek pelatînka ew govend xemilandîne.pismam ü kur xala serê xwe xwarin,xwe hêr kirin.Kiçên gondî ü yên gondên rex û rüya,haha dê jikerba peqin.Lewindîyên dayika wî,ketine bin pên dewatîya!**

**Hemü dimestin,meya serketinê vexwarîye,gond yê buye parçeka orkêstira yê.**

**Heker nihü gond bikavil ve,bête dizîn,kesê ageh jê nîne.**

**Yê dinîva rü sipîyên gondî da wek peykerekê navdar, herçendekê pîremêrek devê xwe dibite bin gohê wî û pêk ve dibite kenîya wan.**

**Wan rü sipîya jî pê xweşe nihü birex wî ve dirüniştîne,kes cihê xwe ber nadit,da kesê dî ne ête cihê wî.bila her mîzildanka wî ya tijî mîz bit!**

**Zirna sivik bû,hemü bileyizuk ve beref zavay hatin.**

**geleka milên wî girtin ü birine dîlanê,ligera duwê ya dîlanê, lewindîyên kiça liesmana xwe dixwarin.Dengê demanca Mamê wi biser dengê hemü çeka diket.**

**Nihü demê bûkê ye. bûk înane destê wî.dû sê ya pêkve xwe lidestê wî didan û wêne digel digirtin.**

**tilîlîya ü dengê zirnayê liesmana gohnêlî dikirin,genc har bûn,kiç şêt bûn,çend jin û mêrên liwî gondê,hemü înan destê êk.alekên zirnabêjî bûne puvdanik,paxlên wî jişabaşa pir bûn.**

**Hemü dixuha xwera bênivêj bûn.Divîya kasêt zü bidawî bêt.**

**Hizira bire şeva zavatîya wî.hizir har bûn,nêratîya wî dil hişîyar kir,kasêt dûbare bû,liber sîngê bira zavay rawestîya.**

**- Tû dizanî dê çi kî?**

**- erê.. Ma ez biçükim?**

**Dergeh vekir,ew hîvîya jiyê xwe hemüyê kar bû dikir,ya lihîvîya wî.**

**Silav kire wê nêrgza jinû geş bûy.Silava wî bibişkurîneka şermîn ve wergirt.**

**Deng jidehol ü zirnayê nehat,pist pist kêm bû,ronahî hemü hatin vemirandin,hatin ü çûn nema,bê dengîyê xwe biser jora wanda girt,tinê dengê awazên dilê wê dihate goha..**

**Dengê hatin ü çuna bira zavay zêde bû,gohên wî digezandin.**

**Berî zirna bêj liberderê jora wî,serê zavay bêjit,û berî ser subehîya wî pîroz bikit.Şeq şeqa seqatên dergeha hişîyar kir.**

**Rabû ser xwe,da xelatê zirna bêjî ditê,serê wî bibanê textê diser wî da ket,hate ser rastîya jiyana xwe.**

**Careka dî xwe dinav gelek mirovan da dît,gelek çav û gelek deng ü gelek pirsîyarin.**

**Hindî linav wan serü çava gerya,tizbîyên babê xwe didesta da Nedîtin,nemîrzoy lawik ü heyiran pê digotin,ne muxtarî berx bû ser jê dikirin!**

**Hemüya divîyan çend demjmêreka lidîwana wî xwe jibîrve kin.**

**Hemüya divîyan rastîya jiyana wî bizanin,hemüya divîyan bizanin ka çi jidervey wê jorê heye?**

**Ezmanê wî axivtin jibîr kirye,lêvên wî livîn jê naêt,hêşta jizfiroka dadkirinê rizgar nebûye!**

**- navê min serdare,ez dûsala yê girtîme,min qaçaxçî dikir.**

**Û te?Te çi kirîye?**

**-.....**

**- ez şeş heyiva..Min kêrek likurekê elman da lidîskoyê.lê cihê daxêye ne mir!Dûheyiv yên mayin,dê derkevim.**

**-....**

**- bira,hema bêje,te çi kir bit bêje,şerim neke!**

**Ewê he tirîyak difirot,ewê dî pitir jised şera kirîne,evê nivistî, çend parên dinîyayê liserin ü şolê reş ü gelek tiştên dî,evê liqolaçê.kiça xwe kuştîye,kiça wî bidüv êkî reş ketibû!**

**Devê xwe bire bin guhê ü bidengekî nizim:**
**-tû wê he dibînî?**

**Bêy çavên xwe jinav destên xwe bînte der.**

**- ew tirke.ew dinav nivîna kiça xwe nivîsitîye!Erê,erê livî welatî hemü tişt rü didin.Vêça ka te çi kirîye?Hema bêje şerim neke!**

**Serê wî çend giran bû,girantir bû.Ew hizirên diserî da kum bûyin.hemü carekadî revîn.çavên wî jixew têr nabin....**

**"- tû dê bîye mirovekê navdar..**

**- hevalên te hemü dibijarene..**

**- paşerojeka geş lipêşîya te ye..!"**

**Pirsîyar zêde bûn,kenî bilind bû,şeq şeqa seqata guh disimtin,serê wî nema liser mila,divîya binivit,dibit carekadî linav mirovên xwe ü ligondê xwe bibite mêvan,bibite zava..!**

**"- evê he tirîyak firotîye..**

**- ewê he qaçaxçî bû**

**- yê dî kiça xwe kuştîye**

**- min dizî kirî ye**

**- kabirayê he dinivîna kiça xwe nivîsitîye**

**- evî hizar şer kirîne**

**– te çi kirî ye?**

**– te çi kirî ye?!"**

**Xav bû,bê hêz bû,çavên wI tarî bûn,tinê şîya pişta xwe bidite wî dîwarê sar..**

**(9)**

**Sipêde baş.**

**Bişkurîna lêvên wê,tîrên çava,pêlên zêrîn yên pirça wê, befira xena kirî ya rüyên wê.şitla nêrgiza.wê bejna bilind.**

**Serinca wî kêşa,û hizra bire roja êkê ya zankoyê.demê ew pirça reş,ew çavên belek,ew bejna sipîndarî dîtî.gelek kar kir,heta şîyay bêjitê..**

**- Sipêde baş.**

**Bidû çavên şermîn,bersiveka pirî hîvî da û burî.**

**Jiwê rojê her roj karê wî nêçîra wan çava û wê pirçê bû.**

**Şeş heyiv bûrîn heta şîyay çareka dî bîseyekê dirêya wê xezalê da danit ü bêjtê:**

**- Sipêde baş**

**Roj bû rojê ew xezal kehî bû,xwe pitir nêzîk dikir,dişîya lidîwana wê rünit.Heta şîyay diderîya çavên wê da Melevanîya bikit.Bihemü vîyana xwe bikevite ditora pirça wê da..!**

**Dawîya xebata wî,maleka biçük pêk hat,ü nihu babê dû kura ye.lê hemü lipişt xwe hêlan û bidüv serê xwe ket!**

**- bibüre,min gûte te sipêde baş..**

**- ê.. Bibüre sipêde baş!**

**- Navê min netaşa ye,ü yê te?**

**Destê xwe yê gelek jibefirê sipî tir dirêj kire nik destê wî.ewê diberüka penteronê kaboy da..**

**Ew destê gerim jiberüka xwe îna der,kire diwî destê nerim ü nazik da ü blêvên şermîn bişkurî.**

**- ez gelek cara te livêrê dibînim.Erê tû kar dikî?**

**- ez lizankoyê dixwînim!**

**- gelek başe,lê zimanê wan girane..!**

**- erê,nihu ez fêrî zimanî dibim!**

**- tû xelkê kîş welatî?**

**- bibüre,eve mêtiroya min hat,divêt ez biçim..**

**- heta dîtineka dî**

**- heta dîtineka dî**

**Her roj sipêdê,liwî cihî çend çirkeyeka lihîvîya mêtiroya xwe dima.Dibû gohnêlîya çavên wan.Gelek cara xuhê destên wan têkda digirtin.gelek çara mêtiroyê dihêlan ü diman bû mêtiroya bidüfira.gelek çara direng diçû zankoyê.**

**- ez jidil eviro ya bikeyif ü bibextim.Hindî vê dinîyayê keyifa min hatî ye.**

**Eviro tû mêvanê minî,eviro tû hatîye mala min.Te çi divêt bêje?Bixwaze?Jidlê min..Heta gîyanê min,her tiştê te bivêt ez amade me.....?**

**- supas,bibüre,min divêt hevalînîya me jituxîbê xwe derne kevit.Bû zanîna te,ez xudan jin ü biçükim,û min jina xwe ü bçükên xwe jigîyanê xwe xuştir divên.**

**- bibüre,bibüre,ez te jiwan nastînim!Tinê min divêt xizmeta te bikim,tû yê limala min.Dê çi xoy....?Dê çi vexoy....?**

**Min hemü rengên vexwarina hene....!**

**- bibüre,ez vexwarinên kihulî navexum.**

**- ew çewa?!Da bûte şîrekê biçüka bînim?!**

**Bi kenîyeka mê qesta jora xwarinê kir.**

**- erê,bawer bike,ez gelek hez jişîrî dikim,heta ez bûyme zava jî,her roj sipêdê dayika min şîrê miha dida min.**
**kenî zêde bû,suhbet belav bûn,seredan berdewam bûn.**

**- eve sê çar care tû diêye mala min,ü her car tû dilê min dihêlî,û çu tişta venaxuy.lê vê carê tû jidestê min qortal nabî!**

**Perdaxa votkayê dana ser wê mêza liber sîngê wî,ü êk ma didestê wê da.**

**- Bibüre,ez neşêm vexom!**

**- Qet nabit,divêt tû vexoy!**

**- Min çu car venexoarî ye.**

**- Şerme,xwe vêrbike!**

**- Bibüre,min ne vexwarîye,ü ez xwe vêrnakim!**

**- Başe..Ez dê bü te hindek bîrê înim?!Bîre vexwarina jinaye!**

**Perdaxa bîrê jinav herdû memkên xwe îna der ü kire didestî da!**

**Nevîya jê wergirt,lê piştî benduşka memkên xwe verî û ew her dû bilbil nîşa çavên wî dayin!**

**- jiber xatira van,ewên jidayika min pêve ne dîtîn.ma tû venaxuy?!**

**Berî lêva perdaxê vemalit,bişkujka memkê xwe kire didevî da.wek biçükek sava liber sîngê xwe nivand,her çendekê perdaxek bû dadigirt.**

**Çu tam jiwê vexwarinê ne dihate devê wî.jibilî tama wan bişkujkên rengê wan jirengê memka ne gelek cûda.**

**Liroja dî,hemü tişt jibîrkirin,hemü jivan hêlan,çu nema libîra wî,tinê jivana wan,tinê dîtina wê!**

**Her liber dergehî,xwe havêtê ü dinav sîngê xwe da givaşt!**

**Bextê te me,tû dîsan wan memka nîşa min bide!**

**Were rüne,dê eviro tiştek gelek jimemka xweştir dime te!**

**Zanko jibîr kir,xwandin nema,hîvîya wî.mala xwe,jina xwe, biçükên xwe.Hemü gurî jivanekê,dîtinekê kirin.**

**Wek sovîyekê tubedar,berî bangê Melay limizkevtê amade dibit,gelek şeva heta berê sipêdê ligovenda pirça wê serê xwe dixwar.Mala xwe hêla,jina xwe hêla,bû êxsîrê bendşka memkên wê!**

**Jizankoyê hate derkirin,xanî jê hate standin,polîsa pirsîyara wî dikirin,lihevala berze bû,hizar telefun jiwelatî bû hatin.**

**Ageh jiçu nema,tinê ew gûtin bû wî ferman bûn,ewên jiwan lêvên sur derdiketin.Tinê dinîya diçavên wêra didît.tinê bimejyê wê hizir dikir!**

**"ewê he,kiça xwe kuştîye,ewê dî,tirîyakçîye,ez qaçaxçî bûm!"**

**- bibüre Mamusta,hosa bû te naçite serî!Tû dê bû demekê dirîj livêrê mînî,vêca xwe vêrî jiyana me bike!**

**Divêt tû digel rüdanê bijî,heker dê dîn û har bî!**

**- Nene,ez bawerim Mamusta jihindê mazntire,ü gelek tiştên hosa biçavê xwe dîtîne,mane Mamusta?**

**Kenî tijî jora girtîxanê bû,pist pist zêde bû.**

**Azad hate ser hişên xwe,lidur xwe zifirî,zanî ka diçi kawdan daye.Zanî ewa biserî hatî ne xewne!Rastîye,divîya bikite hewar.**

**Madê kê guh lê bit?Divîya birevit û jidinîyayê hemüyê der kevit,lê dîwarên girtîxanê dasê ne.gelek lidûr xwe zifirî,gelek tengav bû.**

**wî tolazê eve demeke çu deng jê naêt.Milê wî kirt û bişkurî:**

**- Bêhna xwe fireh bike,tengavî didüv kurtin.**

**Bû cara êkê dilê wî kêmtir xwe qota.Pîçek jibezîna xwe sist kir!**

**Careka dî wî tulazî destê xwe dana ser milî:**

**- Navê min Kaweye,ez xelkê Kurdistanê me,eve demeke ez divê jorê ve,peşêmanî tinê fayde nakit!Divêt mirov mifay jişaşyên xwe werbigirt,ü bû xwe bikite aqil,da carekadî toş nebit!**

**Bestîyê devê wî berda,her wekü jinü fêrî axiftinê dibit.**

**- bib..Bibüre,tû jiber çi livêrey?**

**- mala xudê ava,çend axiftinek jidevê tederketin.Em dê gelek axivin,em dê gelek suhbeta kin,roj û şev didirêjin!**

**Xwe pitir nêzîkî wî kir,ü cihê xwe xweş kir,divîya baş bikêşte nav suhbeta xwe da.**

**- Bira,ez jî qaçaxçî bûm,min mirov dibirine dewletên dewrü bera.eve welatekê seyire,penaberyê nadite kesê!**

**Ü nahêlit kes jê derkevit ü biçte welatekê dî!**

**Eve min behsê xwe kir,divêt tûjî bidirêjî behsê xwe bikî,tû kî? Bû çî girtî?Çend sala?Gelek pirsîyarin.divêt tû bü me bersiv bidî,da bêhna te jî û ya mejî fireh bit.Lê raweste da bû te çayeka xweş çê bikim,paşî dest pê bike!**

**Dû sê hevala xwe nêzîkî cihê wî kirin,her wekü mîrzo dê çîroka mem ü zîna bû wan bêjit!**

**Zanî jivî deravî dernakevit,heta parzînkê xwe vala nekit,zanî jiwê zifirokê dernakevit,heta ya didilê xweda bû hindek goha vala nekit,zanî barê wî jişîyanên wî zêde tirin.**

**Divêt hindek harî wî rakin,zanî ew barê giran,biwî bitinê na ête helgirtin,zanî kulên dilê wî hosa naêne derkirin,bisanahî derman nabin!**

**Dû sê cara,wek mîrzoy cihê xwe xweş kir,destên xwe têk husîn,berê xwe da wan serüçavên dinîva xwe da berize kirîn:**

**- Hebû,nebû,kes jixudê mazntir nebû,kes jimin direwîn tir nebû!**

**Kenî tijî jora wan bû,ewên heta wê gavê nehatîne nêzîkî wan,ew jî hatin ü cihê xwe girtin ü gohên xwe bel kirin!**

**Çend çirkeyeka bê dengyê jora wan dagîr kir.**

**hizirên azadî carekadî wek hestîyê şkestî xwe lêk dan.**

**– gelek tişt libîra min nînin,ez nizanim çi hatîye serê min?**

**Tinê ez baş dizanim,ez neyê vî cihî me!Eve ne cihê min e,ez çewa hatîme?Ez jî nizanim?!**

**Kartêkirina heşîş ü hêruwîynê hêşta liser gîyanê wî dizal bûn!**

**Difina wî dixorandin,leşê wî diazirandin.neşîya xwe liser pîya bigirit.**

**Dihal diçû,gelek çara dikete halê mirinê,derdê wî tinê pileka wê toza jehrê ye derman dikit...**

**Tijî kun ü qolaçên girtîxanê heşîş ü hêruwîyne.derdê wî her zü derman kirin!**

**Hêşta yê libin çavdêrîya dixitora,dilê wî ü berxwedana gîyanê wî,hêşta gelek diwesitîyayne!**

**Gelek denga pêkve gotin:**

**- Xwe ragire,xwe liber bigire,tû hêşta yê gencî.**

**Çavên hemüyan man linav çavên wî,ewên bûyine girê ü sor bûyin.**

**Dû sê kesa enîya wî û milên wî perxandin,dile dilê wî didan.**

**Eve demekê dirêje kesê hosa nazdar ne kirîye.eve demekê dirêje.kesê nedaye bersîngê xwe.eve demegê dirêje çu sîngên tena hembêz nekirîne!**

**Dinav destên wanda nivîst.kete xeweka giran.Serê wî danane ser Balîfka wî,lêvên wî tijî bişkurîn bûn,wek biçükekê sava,lihêfa wî biser dadan,bibê dengî her êk çû cihê xwe. demekê dirêj ew jora tijî livîn ü deng,bê gîyan ma,her êk dihizirên xwe da xendqî.her êk dihizirên xwe da çû ber sîngê dayika xwe,xuştivîya xwe.her êk jiwan birista hizirên xwe ve ma hilawîstî.peşêmanyê dilê hemüyan dixwar!**

**Jor bû gorstan,lê eve ne cihê bê dengyê ye.Seqata dergehî bê dengîya wan,carekadî kire volkana livîn ü dengî.**

**- Hilûn,demê xwarnê ye..**

**Şevên dirêj,rojên bê kar,cihê teng,hemü jinihênîya rot kirin. kes nema dû sê cara serhatîya xwe.jiyana xwe,paşeroja xwe,navê yara xwe,navê dojmnê xwe,dikuçka wanda aşkira nekirî.kes nema hemü kun û qulaçên jiyana xwe ron ne kirîn!**

**- Tû dê xwe kule dar kî,dê êşek giran te girit.Ya dilê xwe bêje,serhitîya xwe bêje,dilê xwe rihet ke.Çu nehêle didilê xwe da.**

**- Min hemü tiştên xwe firotin û ez hatim,ne paspurte ü ne kaxeza karîye.ez mam dikempa da,neşîyam bizifirim,ü ne hatim wergirtin,mirovên min yarî bimin dikirin,digûtin,hindek dû sê sala piştî te hatîne,nihu xanî ü erd û jin û turmbêlên wan tijî Kurdistanê ne!Tû çi dikî?!Ma tû biwan nînî?!**

**Ew nizanin ka hindek çi dikin,heta para kum dikin?!**

**Ew nizanin gelek xudan pare,pîrejna mar dikin!Ew nizanin, gelek xudan pare,karên ne dirust dikin!Ew nizanin kes bisanahî para kum nakit!Ew nizanin divêt her xüka wan para bête dan,çi xuşîya mirovî bit,çi ya biçükên mirovî bit,çi mirov bixwe bit....**

**Ez jî gelek ture bûm,min gût,dê hindek kara kim.bila dixirab bin,ü dê hindek para lêk dim û dê zifirim.Min nezanî dê serê min jî gurî para bit!**

**- te çi karên xirab kirin?**

**- dermanik firotin!Heşîş,hêruwîyin..!**

**- dermanik?**

**Êkê dî her zü gut:**

**- te bikar jî di înan?**

**Çavên wî zîq bûn,bêhna wî lez kir,rengê nav çavên wî zer bû.**

**- Belê.. Min bikar dînan.Heta ez jê rizgar buym,ez bûm nîve mirov!**

**Tirsa azad verevî,bêhna wî pitir fireh bû,cihê xwe xuşkir.**

**- min hizir dikir,ez bitinê me!Min digût,dê çewa sebra min digirtîxanê ve êt?Min nedizanî wek kempane!Hemü mirovên bîyanî ne,tijî xelkê me ne,tijî heval ü biraderin!**

**- Erê,erê, liser vê hemüyê ra,xelkê me baştire jixelkên dî, gelek bû xwe ü bçükên xwe paşerojeka baş bidestve înayne ü geleka bineciha xwe liKurdistanê jî danaye, ü geleka livêrê jî ketîne ser rêya dirust,ü paşeroja biçükên xwe misuger kirîne,her gava bizifirine Kurdistanê,Namînne birsî!**

**- baş ü xirab linav me jî hene..Me çu nekir!Em man bê paşeroj.**

**Kabirayekê bêhn teng neşîya xwe:**

**- Min çîroka te zanî ba,bila ez mirbam!**

**Hevalê wî divîya azadî pêve kit**

**- dîyare çîroka wî jiya me hemüyan seyir tire?!Û divêt em rastîya wê çîrokê bizanin!**

**Her wekü digel dîwarî diaxivin,axivtina wan nêzîkî guhên wî ne bû.**

**Serê wî yê dinav her dû destên wî da veşartîye,her wekü hindek dê jinav mila hilkêşin.**

**Wek pîremêrekê nesax yê dinav cihê xwe da rüniştîye.hizra mejyê wî ron kirîye.**

**Her duwa ew bê dengîya gîyanê wî şêlandin,û lihzirên wî yên westîyay bûne mêvanên dargiran.**

**- Bibüre,me divêt harî te bikin,te jivan hizir ü xema dür kin....!**

**Serê xwe yê giran jinav destên xwe bizorî îna der.Navçavên wan liber çavên wî,dizer ü bê şînwar bûn.Çu çav çu dev ü difna xüya ne dikirin.Herdû jêk cûda nekirin.kes jiwan ne nîyasî,tinê zanî eve ser ü sîmayê dû kesa ye..**

**- hewe çi divêt?**

**- me divêt tû jî bêye dinav meda,beşdarîya jiyana me bikî, hosa bûte naçite serî,dê xwe kujî.**

**Kenîyeka zer lêvên wî yên xav kirêt kirin,lê kuxkê her zü xendqand..**

**- Hêşta min xwe ne kujtî ye?!**

**- Ne ne mala te,şolên giran diêne serê zelama.Tû hêşta yê gencî,divêt xwe liber bigirî.**

**Hevalê wî destê xwe dana ser milî,wek pîremêrekê dan emir:**

**- lawê min,ewa te kirî,te kir û bûrî.peşêmanî fayde nakit.ya baş ewe tû mifay jiwê xeletyê werbigirî,jiyana xwe ya may bidirustî bibürînî.ewa çuy jibîr bike.hemü ya lipşt xwe bihêle, tinê hizira rojên bêt bike,tinê hizira mala xwe û biçükên xwe bike,tû dê her derkevî,dê qesta mala xwe kî.Ma tû dê heta heta digirtîxanê da bî?**

**Hevalê wi milê dî girt:**

**- hilû navê xudê bîne,dilê xwe xweş bike,digel me rabe,ü rüne,dê roj ü şevên te bisanahî bürin.**

**- Heker hün bela xwe jimin vekin..Heker hün mayê xwe dimin nekin..Dê jiyana min gelek xweştir bürit!**

**- Em desta jite bernadin,dixitûrê te jî ya gotî.**

**divêt tû nemînîye  bitinê,nabit tû gelek hizira bikî!**

**Çend çirkeyeka bêdengîyê biserda girtin.Hişên wî lêk kum bûn, zanî van hevala tiştek divêt,ü bisanahî bela xwe jivenakin.**
**-hewe çidivêt?Ez çi bû hewe bêjim da hün bela xwe jimin ve kin?!**

**Herdû lihîvîya vê pirsîyarê bûn:**

**- behsê xwe bike,tû kî?Xelkê kîj bajêrî?Çi kesî?Çewa hatîye girtin?Jiber çi...?**

**Pirsîyarên wan wek gijloka biharê liser serê wî dibarîn.**
**bişkurînê lêvin wi yên qeşapî xemilandin.**

**- Hewe divêt harî min bikin?Yan yarîya bimin bikin?**

**- Nene,binavê xodê,me jidil divêt harî te bikin...**

**(10)**

**- Sipêde baş**

**- Sipêde baş..Keremke?**

**- Ez azadim,derçuyê kulîja endazîyarî.Serketîyê êkê liherêmê.**

**- Ser seran,ser çavan,kerimke..Mamusta lihîvîyate ye, keremke,keremke..**

**Her liber dergehî,Mamusta jipêşve rabû,destê wî givaşt ü da bersîngê xwe:**

**- Te serê me bilind kirîye,tû hejî her tiştê te bivêt,her cihê te bivêt,keremke rüne.**

**- Bibüre Mamusta,ez lidüv daxwaznama te hatîme!**

**- Tû gelek bixêr hatî,ez jî lihîvîya te bûm.Tû dişêy her sube dest bikarê xwe bikî.me bü te cihekê destnîşan kirîye.hîvîye bidilê te bit.**

**- Her cihê hebit,ez amademe.min divêt jidil xizmetê bikim, min neşîya pêşmergatîyê bikim,ez ne gehiştim şoreşê.ez yê biçük bûm liberxwandinê,lê nihu min divêt wê kêmasîyê pir bikim,pêşmergatîya xwe biqelemî bikim....!**

**- Xebat,her xebate,çi biqelemî bit,yan bitivengê!Liher demekî xebat birengekîye,her şoreş ü çekê xwe..**

**Lidemê şoreşê,geleka xebat kirin,geleka gîyanê xwe kirine qorban.Nihu gelek jiwan kesa neşên ew xebata tû dikî bikin. Ewan rolê xwe biserferazî bire serî,nihu rolê xwandinê ü zanînêye.Em hemü kardkin jibû vî welatî,da em bişên bigehine karwanê pêşketinê,da em bişên digel milletên dinîyayê bijîn,û nehêlin dojmin dinav meda serî hildin ü hêlînên kehî avakin..**

**Û jibîrneke?Ewa bab û bayirên te kirî,naête jibîrkirin...!**

**- Eve hîvî üumêda me hemüyane.**

**- hîvî ya serketinê bû te dixwazim dikarê te yê nü da,hîvî dikim ka çewa lizankoyê,yê serketî bûy,wesa dikarê xweda jî yê serketî bî..**

**"tû mirovekê gelek zîrekî,**

**Tû dê bîye kesekê navdar,**

**Paşerojeka geş ya lipêşîya te..."**

**(11)**

**- Ez likîve me?!Bû ez livêrê me?!**

**Bidengekê tijî kenî ü bşkurîn,û diberra karê xwe encam dida:**

**- Tû yê lixestê,nihu tû gelek yê başî ü dîyare tû dê zü sax bî.**

**- Ji ber çi ez lixestê me?!Çi limin hatîye?!**

**- Ne ne çu lite nehatîye.Ji ber,jiber,..**

**- Jiber çi?Ha..?Hîvîye bû min rastyê bêjî?!**

**- Bibore,nihu dixtor dê êt,tû dişêy her pirsîyara te bivêt jê bikî**

**- Wesa dîyare,ez gelek yê nesaxim?!**

**Lewa hewe ez jigirtîxanê înayme xestê....!**

**- ne,wesa nîne.Nesaxîya te ne ya dijore.tinê jiber wan dermankên te dikêşan.Bisanahî tû jikartêkirina wan rizivar na bî.taybet tû carekadî digirtîxanê ve dikêşî...!**

**Divêt tû dibin çavdêrîya dixtora da bimînî.**

**- Xuzî tinê kartêkirina dermanka ba....**

**Gelek tişta jiwan dermanka pitir ez êşandîme,ez bawer nakim çu dixtor min jikartêkirina wan rizgar bikin...!**

**- Belê..?Te çi gût?**

**- Çine.. Çine..**

**Piştî jikarê xwe bidawî hatîn,derketin û dergeh jipiştve kilîl dan.**

**Dengê kilîlê diserî da hizar hîvî ser jê kirin,hizar xewin berze kirin,hizar kul likulên wî zêde kirin.dengê kilîlê,hizar cara deng veda,hizar cara jidengê seqata girtîxanê dijoar tir bûn.**

**Zanî divêt baca hemü xeletyên xwe bidit.**

**"tû dê bîye mirovekê navdar,**

**Paşerojeka gelek baş ya lipêşîya te...."**

*******

**Destê yara wî didestî daye,dinav baxçê zankoyê pîyasa dikin.Dûhî wek vî demî,şahîya nîşanîya wan bû.Çend heval übirader kum bibûn.**

**- Eviro xuştirîn roja jiyana mine..**

**- Ne, duhî xuştirîn roja jiyana min bû..**

**Kenî biser baxçey da bilind bû.Wek dû pelatînka ew baxçe xemilandîye.Yê dikupka xoşîyê da,kesê jixwe bibext tir nabînit,her ewe ser kêşê jiyanê..**

**Dengê xodanê karî,hizirên wî sotin.**

**- subehî ne êye karî,**

**- ez te ne bînim livara,**

**- tû bikêr çu kara naêy..**

**Wek har ü dîna rabû ser xwe,wan sonde ü sirinca,wek qeyda girêda bûn.ma dicih da,neliv ma,dixuha xwe ra ü dinav hizirên xwe da,çu nemaye dê har bit!**

**Çu tişt neşên şev û roja rawestînin.Her roj karê xwe dikit ü bihemü hêza xwe,qebê şevê dixwazit,şev şerim nakit,her zü jiber rojê direvit.Lê her zü pîlaneka tarî bû rojê didanit ü dinava pêlên xwe da dinivînit...!**

**Dujmnatîya şev û rojê,xemên wî digel xwe sist dikin,barê wî sivik dikin.**

**Ev ware bidilê wîye,kes pirsîyaên girêt jê nakit,kesê nevêt jiberperên jiyana wî ya şêlî çu nehênîya bizanit.**

**Bû kesê nexeme ka çi kirîye..?Kes pê na kenit..!Kes dilê wî nahêlit..!Kes dermanka bizorî naditê..!**

**Hemü hevalên wî yên vî warî,kiçên ciwan ü xwîn şirîn ü hestî sivkin.karê xwe bibaştirîn reng dikin,hemü liber xizmeta wî dirawestîyay ne.**

**Wan seruçavên şirîn,wan bişkurînên nazidar.gelek jixemên wî verevandîne.Gelek jihîvyên wî sax kirîne.gelek cara xewnên xoş dibînit.**

**Tinê dengê girtina wî dergehê lipêş çava bûye berê reş, lihivîya tewafa wî.wek sofîyekê dîndar.tinê dengê wê kilîla digoha da bûye dengê gullebarana gîyanê wî,dengê sotina hîvyên wî, dengê girtina dergehê xoşyên wî.**

**Rê liber diête girtin.hemü tişt dimînine bê gîyan,bê livîn, hemü tişt,dimînne lihîvîya vekirina wî dergehê lipêş çava bûye dergehê mana wî.dergehê jiyan ü paşeroja wî...**

**Dibit rojekê diwi derigehî ra.dayika wî,babê wî,jina wî,digel herdû kura bêne jor.Dergeh vebibit,ü hemü pêkve bêne seredana wî,dibit..Dibit....!**

**Pençera jora wî,dikefite beramberî baxçekê gelek ciwan, dinav wî baxçey da.rêyeka hatin û çûna mirova heye.**

**û hindek textên bêhn vedanê libin wan dara hene.**

**Çend carekê liber wê pencerê dirawestit.berê wî dikefite wan pêlên mirova,ewên qesta xestê dikin ü didestên wan da,qeftên gula ü dîyarîne.car jî digel nesaxên xwe dinav wî baxçey da,pîyasa dikin,û liser wan texta dibite kenî ü sehbeta wan..**

**Dilê wî diqormçit,dinîya lipêş çava tarî dibit.**

**Ew bitinê livê cîhanê yê jibîr kirîye,kes nîne bibite mêvanê wî kes naête seredana wî,tinê ewe yê bê heval,tinê ewe yêbê kes û kar,tinê ewe lihîvîya mirinê...!**

**Dengê vekirina wî dergehê lipêş çava bûye derkehê welatê wî.**

**Bêhna wî fireh dikit,tinê ew hîvîya may pê dijît,lê tirsa girtina wî dergehî her,liser hizira wî ya zale.**

**Roj bo rojê hizirên wî yên belav?Carekadî kum dibin, vedcemine ser êk,xwîna wî ya şêlî ü tjî Dermanik.roj bo rojê ya zelal dibit,ü leşê wî yê lawaz,yê xwe lêk didit ü bigîyan dikevit.**

**Çu nemaye dê ête ser hêza xwe ya caran,çu nemaye dê jiqeydên dermanka rizgar bit.**

**Lê hêşta qeydên yasayê didestanda diasê ne.hêşta baca şaşyên xwe bidawî ne daye.hêşta dengê kuxka wî ya şêlî ye.**

**Hîvî na mirin,çav lirê na westyên,xudan umêd her lihîvîya dawîya umêdên xwe dimînin.**

**Destê xwe dana ser milê azad.piştî gelek ew kaxezên didesitî da têkvedayin,piştî dû sê caran digel sistirên xwe jî axivtî kenîyeka şirîn jilêvên wan dibarî.**

**- Gelek başe,gelek başe..Min bawer nedikir tû dê hosa bisanahî sax bî.tû nihu yê sax û dirustî.Pîroz bit,ü hîvî darim dijiyana xwe da yê serketî bî..**

**Destê wî bigermî hejand,tijî nav çavên wî kenî û bişkurîn bûn.**

**Sistira xwe havête nav sîngê wî da ü pîrozbahîya wî kirin. dengê kenîya wan tijî jor bû.**

**Dilê wî yê pîr carekadî çeq dan.carekadî geş bû,xwîna dilê wî,wek volkanê azirî.**

**- Supas dixitur,gelek supasîya hewe hemüyan dikim.**

**- wek ez dizanim demê girtina te jî gelek nemaye?Hîvîye eve dawîya girftaryên te bin!Lê min divêt bêjim,berî tû jinik me biçî.em dê nav û nîşanên dixitorekê dî dine te,hîvî ye tû seredana wî bikî.**

**- bibüre, jiber çi dixitor?**

**- bila bû te hindek taqîkirina bikit,jibû silametîya te.**

**Berî dixitor derkevit,berê xwe da sistira û gût:**

**- çu dermanên dî ne dinê,heker eve xilas kirin,birîyara derçûna wî bidin,bila biçite cihê jê hatî,ez jiêşa wî pişt rast bûm.**

**Wek kutireka sipî,divîya esmanî hemüyê têkvedit,divîya bikite hewar,divîya bikite girî,divîya bikite dewat,divîya serê xwe lidîwara bidit.**

**Demê didanên wî jibin lêva derketîn.hizira bire girtîxanê, ewa lihîvîyaü.**

**Her çende ew jî kêm ya may,dê jiwê nexoşîyê jî rizgar bit.lê dilê wî her yê bê hîvîye.Dê çi kit?Dê kîve çit?Dê çewa xwe xudan kit?Neşole ü ne cih û ne harîkarî..?!**

**Dîsan kete dihizra da,dê tuşî nexoşîya ü mirovên xirab bit. dê dîsan kefite kulana.dê neçar bit xeletîya bikit.**

**Dengê dixiturî hizirên wî cemandin.**

**- tû yê ji êşa xwe rizgar bûy,hîvî ye dijiyana xwe da yê ser ketî bî ü tuşî çu nexoşîya ne bî..!**

**(12)**

**Seruberê kempa wî,gelek ji wê girtîxana eve berî çend rojeke jê xilas bûy kembax tire.Ligirtîxanê hemü tişt dibin kuntirola polîsan da bûn.Xwarin ü nivistin ü kar kirin.kesê nedişîya jituxîbê bê lezetîya xwe derkevit.**

**Livê kempê çu yasa ü çu polîs nînin.her kes û bextê xwe ü têgehştina xwe.her kes xwe didanit yasa ü dadwer.**

**Yê razî bit dê jît wek wan divêt.yê nerazî bila bû xwe pirsîyara cadekê bikit!**
**jora wan ya vê carê,gelek baştire jicarên dî.çar kes û her çar xelkê welatekî.hizirên wan,zimanê wan,kulturê wan,êke. Ev nêzîkîya gîyanê wan jiyana wan bisanahî dikir,wek bira û wek êk xêzan diwê jorê da dibûrandin.**

**Lê jiber tengîya cihî,ü bê umêdîya jiyana wan,ü bê karîya wan,diêxistine gelek şere devan da.liser cawazîya hizirên wan,liser cawazîya pila têgehiştina wan,dawîya wan her pêkve jiyan bû.jineçarî gelek kêmasî liser xwe qebül dikirin. da jiyana wan biçite serî..**

**Hemü yên lihîvîya mirinê,mirin tinê dê wan hinêrte welatê wan.**

**- Heker ez mirim,kelexê min bibine Kurdistanê,min linav van ne veşêrin!**

**- Erê..Eve daxwazîya me hemüya ne.**

**Kenyê ser jixemên azad stand**

**- Heker em mirin,jinü kelexê me bibine Kurdistanê?!**

**- Erê..Bila me dinav van kafira da ne veşêrin.**

**- Dê malên me çi likelexê me kin?Me bisaxîya xwe çi bû wan nekir,dê kelexê me bû wan çi kit?Tinê dê xemên wan zêde kit!**

**- Ne ne,bawer bike, dibit bû demekî bikevne dixema me,lê dê dilê wan pitir rihet bit,ü dê me jibîr kin.**

**- Ez nizanim em çi dikin?Me çi divêt?Em lihîvîya çi ne?**

**- Erê ma bû em nazifirin?Welatê me nihu gelek xuşe, avedan ü kar ü tenahîye.**

**- Liser xuşîya welatî,vê nexoşîya livan welata,taybet bû me ewên ne hatînewergirtin,mafê çu kara nebit,çu pê çê nabit,neşêt harî malên xwe bikin.neşên xwe xudan bikin.**

**- Bira..Nê zifirîn jî me pê çê nabit,ma me çi maye liwelatî? Nexanî ü ne kar ü ne pare.tijî liser milên me deyn ü qerin, madê çewa zifirin?**

**- Paşî te livêrê dinîya xirab kir!Nê her bê kar ü bê pare û bê hîvî...!**

**- Erê raste,liwelatî dê digel mirovên xwe jî,ü dê beşdarîya jiyana wan kî.Birs û tirs,bila hemü pêkve bin.Birastî divîya ba, hukmeta me birîyareka baş daba liser vî babetî.**

**- Erê,divîya ba bû wan kesên dizifirine welatî,hindek harîkarî kirban**

**Bû nimune,xanî dirust kiriban,kar peyda kiriban..**

**Kenî tijî jora wan bû,êkî digel kenîya xwe gût:**

**- her êk ü jinek jî bû înaba..**

**- rastî em yên hatîne şoreşê!Me dinîya bû welatî xirab kir!Da ewjî bû me xanîya ü karî peyda kin?!Me kêm şehîd ü aware yên heyin!**

**Jor bê deng bû,her êk dicihê xwe da,dinav hizirên xwe da, Melevanî dikirin.Her êk jiwan,hizira liser perên xwe bire welatî,bire dikuşa dayika wî da,bire bersîngê yara wî,jina wî, bire dinav biçükên wî da.bire dinav hevala..**

**Dengê saman,bê dengîya wan şkand**

**- Me çu nekir,hevalên me her êkî eve sê çar xanî liKurdistanê kirîn,û deh parçên erdî ü jin ü her êkî sê çar birayên xwe înane ewropa,jiblî parên hilgirtî liber destê wan.**

**Dergehê axiftinê vebû,aso cihê xwe xuş kir:**

**- Erê bawerbike,ewên digel min hatîn,nihu pitir jisê xanîya û deh dikan û hindî te bivêt parçên erdî,ü jina xwe jî îna,nav mala wî jiya serokê vî welatî xoştire.**

**- Bira..Ewa zü pasport wergirtin,û biser karî hilbûn.**

**- Ne ne,bawerbike,kesê hindî me şol nekirîye.Lê qumar ü cîhaza,çu para bû me nahêlin.bila em dirast gû bin..!**

**- Qumar..ax bû derdê qumar̋ê,kafir fêrî cîhaz ü qumarê nebin**

**Carekadî bê dengîyê hemü ser şorkirin,hemü dinav pêlên xwe da xendqandin.livîn jikesê nehat,her wekü hemü peyker.**

**Dişanogerîya jiyanê da,her ekterek lihîvîya rolê xwe ye. hemü lihîvîya derhênerî ne.**

**ronahî ya kême,deng nîne,ew telefizyuna berî çend roja jiser cadê înayin.hindek cara dîwarê bê dengîya wan kun dikit,leşê wan dixorand,hizirên wan dimejî da har dikir.Wek pivdankeka tijî ba,cih nema hizira bikin,çu nemaye dê pivdanka mejiyê wan peqit.**

**Hizir azirîn,dilî xwe dinav sîngî da dixwar,agir berbû leşî,cih tijî pelên sorin.hemü êxsîrên zimanê xwe ne,hemüya divêt xwe rüs bikin jigunehên xwe.liberamberî dadwerekê bê dil.da bidijwartirîn yasa birîyara kunehbarîya wan bidit....!**

**Hemüya divîya wê bomba jehir kirî jidilê xwe û mejiyê xwe derbikit!**

**- Min baştirîn kar hebû,her jiheyva êkê ez hatîm vî welatî. min dest bikarî kir.min kabirayekê gelek baş nîyasî.ü dgel kar kir.ez bûm hemü tişt liser karê wî.bawerîya wî bidirustî bimin hat.kar hemü kire didestê min da.ez bûm heyî ü neyî yê wî. gelek cara biheyva ne dihate cihê karî.seruberê karê yê karkera.hemü didestê minda bû.**

**Parên min binîva dilê min didane min.min nedizanî dê çi lipara kim?Gelek cara bû mala xwe hinartin,xanî kirîn,erd kirîn,zêr bû jina xwe kirîn.turmbêl bû birayê xwe hinartin.**

**Ez bûm mîrê bê xolam...ne ne min gelek xolam jî hebûn.**

**Bêhna hevalên wî teng bû:**

**- ê..?Pa çi lê hat?Ka ew pare?Ka ew xolam?Hemü bûne xewin,yan eve filmê hindîye?**

**- ne, bawer bikin eve çîroka mine,bêhna xwe fireh bikin da ez hemüyê bû hewe bêjim.**

**- ma ewa te gûtî ne hemüye?**

**- ewa min gûtî êk jisedê ye..!**

**- dê bêje bira, jiserî..Heta dawîyê,ma me çi heye?**

**- rojekê piştî karî,demê bêhn vedana min,mêvanek bû min hat,em pêkve çûn gerîyanê linav bajêrî...**

**Her sê hevalên WÎ pêkve gûtin:**

**- êê...?**

**Pitir bisohbeta xwe şahî bû,cihê xwe xoş kir.**

**- em gelek gerîyan.Lidemekî wî kabiray gût:**

**"da biçine divê gazînoyê ve,qehwekê vexun."**

**Min jî şirim kir ü em çûn jor..**

**Dîsan hevala neşîya xwe,devê wan beş bû:**

**- ü paşî..?**

**- çi bêjim..?Tijî jor mirovin,her êk liser cîhazekî yarîya dikit, wesa qerebalxe,dê bêjî vîstevala yarîyên cîhazaye!**

**Em jî rüniştin,û me qehwa xwe vexwar.hevalê min dest da markekî ü kire diwî cîhazê birex me ve.**

**- Ê..?Nebêje ew mark bûne hizar..!**

**Bawer bikin,ew mark diçend seeteka bûne sê hizar mark.**

**Wey babû!Ew çewa?!**

**Hevalekî gût:**

**- erê,ez bawer dikim.Her kesê jinwî xwe fêrî wan cîhaza bikit, ew dizanin ev kese yê nûye,û wî tema dikin,da her bêt,da bawerîya wî bêt,da bibite êxsîrê cîhaza.**

**- ê..?Ka tû bixodê raweste,ka çi lê hat?Ka ew pare kîve çûn?**

**- erê,jixodê bawer bikin..Eve bû rüreşîya min bû!**

**Da ez fêrbibim,da ez tema bim.**

**- ew çewa?Rüreşîya çi?**

**- erê,rüreşîya min bû.Piştî wê rojê ez her roj piştî karî vêrbûme wan cîhaza,her filsê min hey û her filsê min kar dikir,êvarî dikire diwan cîhazada,heta ez bûme birayê marî,min xwe jikarî didizî,min parêt karkera jî lê dan,min deyin kirin.**

**Dawîyê min kar jî hêla,ü ptir jisîhhizar markên xudanê karî û yên hevala ketin ser min,jiblî ewên min sê çar sala kum kirîn. Dawîya wê ez eve ketîme vê kempê..**

**Kenîyeka şêlî bê dengîya wan sax kir.**

**- ez çîroka xwe bêjim!Hün dê bêjin eve filmê hindîye!Eve çîroka "sindîbade"....!**

**- bêje,dilê xwe paqij bike.**

**- Hê hê,dilê min ü mejiyê min biaxiftinê paqij nabin.Tinê kujtina min dê min paqij kit...!**

**- Ne ne,we ne bêje,pare qirêja desta ne,diçin û dên!**

**- Erê heker biserferazî biçin!Dirêyeka baş da biêne mezaxtin. Ne biqumar ü karên püç da..**

- Dê bêje,nê te dilê me heland!

- Ez mazntirîn bikirê turmbêla bûm.bawer bikin,demê min turmbêl dikirîn û dihinartine Kurdistanê,kesê nedizanî kar bikit,gelek cara min deh bar pêkve dihinartin,û min desthelat liser hemü bazarî hebû,livêre ü liKurdistanê jî.

- paşî?Te çi kir?

- min xanî kirîn,dikan kirîn,erd kirîn,her birayekê xwe paştirîn turmbêl bû hinart..

- bes ne bêje hemü çûn?!

Dû sê cara enîya xwe perxand ü bêhneka kür hilkêşa..

- bawer bikin deh cara hindî wan çûn.

- hey hewar,ma te agir berdayê?!

- kak azad,xwezîya agirî.agir da wan sojit,ewên liber agirî.lê evî hemü sotin,ewên liber ü yên dür,hindî wan deyn jî ketin ser milê min û yên mala me..

- çewa?Çewa? Ka hêdî hêdî bêje da ez bawer bikim!

- Firankfort,heçyê firankfort ne dîtî,ewî çu dinîya ne dîtîye!

- Erê,erê, min gûh lê bûye.Ma tû çûye Firankfort ́ çi?

- pare,pare mirovî dibine hemü ciha,taybet heker mirov yê bê mejî bit.

- kê tû birîye wêrê?Tû çewa fêr bûy?

- Dê rawestin.Bila ew çîroka xwe hemüyê bêjit.

– rojekê min deh turmbêl bitelefunê lifirankfort kirîn,ez çûm dabarkim,piştî min parên xudana dayin,kabirayekî her xelkê welatêye.Gûte min mala te,te xwe bikarîve kuşt,kar xilas na bit,were da ev şeve te mêvan bikim,da tû dinîyayê jibîr bikî, dinîya ne tinê kare..!

Xudê mala wî wêran bikit,ka çewa mala min wêran kir.

Ez jî gelek yê westîyay bûm,min gût da ev şeve bêhna xwe vedem,û dê sobe zifirim cihê xwe!

- ê?Bira bêje?

- bira,piştî xwarneka baş,em çûn cihê qumar û yarîya. Dinîyayeka cûda ye,her tiştê püç lidinîyayê,yê liwêrê.

Hemü rengên qumar ü cîhaza,xwarin ü vexwarin,jin û püçatî....!

- te dest biçi kir?Jina..?Yan qumarê?!

- min her ageh jijin û jiyanê nema.Min dest da cîhaza wek hevalê xwe,wî çi dikir,min jî wek wî dikir,heta berê sipêdê. Bawer bikin,min pitir jipêniç hizar marka püç kirin..

**- pêniç hizar mark?!Ma te çewa püç kirin?Tû çewa xisaret bûy?!**

**- erê pêniç hizar.hemü min lirolêtê dan,rolêt,ewê mala min xirab kir,ewê bivêt mala xwe xirab bikit,bila rolêtê bikit....!**

**- Û paşî?**

**- Paşî,her roja dî min ew tormbêl careka dî linîvarê zifirandin, û bixisaretî firotin,û şev lidüf şevê,heta bihayê panzîna tormbêla min jî nemay.Min dest da deyna,êdî kesê deyn jî nedan min,ew rolêt bû xwîndara min,min sûnd xwar,heta ez tola xwe lê venekim,ez bela xwe jê venekim!**

**- Bêje,bêje,ya te jiya hemüya xoştire.**

**- Birayên min,telefun kirin,gûtin ka tormbêlên te?Em yên lihîvîya wan?**

**Min gûtê hindek para bû min bihnêrin.MinGelek turmbêl kirîne ü hemü dinü ü giranin.**

**- ü jidirew? Mane?**

**- Erê jidirew..**

**- Ê?Pare hinartin?**

**- Pitir jised hizar dulara hinartin.**

**Her sê rabûne ser textên xwe,ü pêkve**

**- te çi lê kirin?!**

**Tirsîya êkser bersiva wan bidit..**

**- bêje te çi lê kirin?Ne bêjî,ewjî çûn..!**

**- her ne gehiştine destê min.**

**- pa çi lê hatin?Hatine girtin?**

**- Xûdanên deyna birin.**

**- raweste,raweste,ma çend deyn liser tebûn?!**

**- Gelek, gelek..Pitir jised ü bîsit hizara.**

**- Mal mîrat,mate çi lê kirin?Ma kes nebû te bikujit?**

**- Bela xwe jê vekin.Ez derdê wî baş dizanim,ew agirê mala wî sotî,her ew agire mala min jî sotî..**

**Vêca ewa hatîye serê wî besî wîye.hün jî barê wî giran nekin..**

**- Xuzî her ew ban,deyndar her pirsîyara parên xwe dikin, ü gelek cara dawa gîyanê min dikin,û liKurdistanê mala me hemü yên tuş bûyin.xanî firotin,erd firotin,nihu ewjî yên ketîne bin deynên min.**

**- Bawer bike,çîroka te gelek jiya "Sindîbadî " seyir tire.**

**– ez ne dixema parame.ez dixema pasporta xwe me,ez neşêm bizifirim,ez neşêm sera biçükên xwe bidim,ez neşêm kar bikim,ez yê hêlayme hilawîstî.**

**Piştî demekî kêm dibê dengîya xwe da mayin.**

**Dû denga pêk ve gûtin:**

**- ü tû?Çîroka te çîye heval azad?Yan bawerîya te bime naêt?Husa bû te na çite serî,me hemüya turkên xwe vala kirin,tû yê may.**

**wî hevalê wê gavê çîroka xwe digût,tila xwe dirêj kire dergehî ü gût:**

**- kes jivî dergehî dernakevit,heta çîroka xwe bidrustî bü me ne bêjit.**

**Her dû hevalên dî dest qotan û gûtin**

**- Em jî digel birîyara tene?**

**Azadî cihê xwe xoş kir.**

**- çîroka min hemü dizanin,kes nemaye guh lê nebûy.**

**- ne ne,medivêt tû jiserî heta binî bêjî.Hemü tişta,çu nehêlî. jihebû nebû,heta ev gava em têda dijîn..!**

**Memo xwe jitextî havête xwar ü gût:**

**- ça..Liser min,ez dê bû hewe çayeka xoş çê kim..**

**- Hê hê,xozî ya min qumar ba,xozî ya min,cîhaz ban,xozî ya min tinê pare ban..**

**- Pa..?Ya te çîye?Te çikirîye?**

**- Dê bêje bira,dilê me ne helîne,me hemüya ya xwe gût,tû jî ya hatîye serê te bêje da dilê te rihet bit.**

**- Bela xwe jê vekin,camêrî dê bêjit.**

**- Ez bawerim dinîya hemü çîroka min dizanit.**

**- Çîroka te bû çîroka mem ü zîna?Kî te dinîyast?Kê ageh jite heye?**

**- erê raste,em hindekê jê dizanin,lê bara pitir em nizanin.**

**Memo çavê xwe lihevala neqand,da bes axiftina wî bibirin.**

**- Dê bû me bêje..Piştî hevala te tû hêlay,te çi kir?Çi hate serê te?Tû kîve çûy?**

**- erê herê,te hevalek jî hebû?Berî hemü tişta,behsê hevala**

**Xwe bike. Ya çewa bû?Ya çiwan bû?Ya biçük bû?Xelkê çi welat bû?**

**- Hün nahêlin camêrî behsê xwe bikit.Bela xwe jê vekin,wî çewa divêt,bila wesa biaxivit.**

**- Jê bigere,bila ewjî bû xwe yarîya bimin bikin,ew diheqin.**

**- Em yarîya bite nakin,ma em gelek jite baştirin,heta em yarîya bite bikin?**

**- Ev şeve,şeva danpêdanê ye,eve şeva rüs kirina mejiya ne, eve şeva ladana hemü perdane.Bextê teda,tû jî ya hatîye serê te bêje,da em hemü lipêş çavên êk wek bira bin,da kes jime lomey kesê nekit,da çu nemînte veşartî,da em tûşî çu nexoşyên dî ne bin.**

**Hemüya pêk ve xwe jitextên xwe havêtine xwar,ü liser textê wî rüniştin,û bû hîvî ü daxwaza wan.**

**Serê xwe bilind kir,berê xwe da nav çavên hevala,ewên rengê jidestdana hemü tişta lê xweya..!**

**- Çîroka min gelek dirêje,ne bişev,ü ne biroj,xilas na bit.**

**- Eha wesa başe,heta em dimirim,em dê livêrê bin,ü tû çîroka xwe bêje,ewê mir,eve ew ji xoşîya gohdaryê bê bar bû..**

**Kenyê ew enyên girê ü ew hizirên aloz vekirin.**

**Dengê qorîyê çayê û bêhna wê biser jora wan ket.**

**- eve ça jî dirust bû,dê vêca Pêda here..**

**- birayinû..Piştî ez jipara xilas bûyim,piştî ez jikarî xilas bûyim, piştî min zanko hêlay,min mala xwe hêlay.Piştî çu jimin ne hatî,piştî ez bû polîsa dîyar bûyim,piştî neşîyay çu kara bimin bikit.linîv şevekê hate jor,kabirayekê dî digel bû,bisanahî gûte min:**

**- jieviro ü pêve ne êye vêrê,hilû cihê te livêrê ne ma,bû xwe pirsîyara cihekê dî bike..**

**Hindî min hîvî kirin,hindî min xwe havêt ber pîya,razî nebû. Min divîya tinê wê şevê bimînim,sipêdê biçim,lê wê şevê ez havêtim pişta derî.**

**Jor bê deng bû,her wekü kes liwê jorê ne!**

**Dengê fira çayê jigewirîya êkî hat,hizirên hevalên wî kum kirin.**

**- ê...? Û paşî?**

**Serê wî yê şor bû,jigiranîya hizira,neşîya hilgirt..**

**- Ne ne,rawestin.eve ne serê suhbetê ye,ji serî vêra here.**

**- bela xwe jê veke,ewa dî em hemü dizanin.**

**- ez ketim kulana,bê cih ü bê pare,û bê kaxez,û nesax ü vêrî dermanik ü vexwarina...**

**- tû likîve dinivisitî?Xwarin?Vexwarin?**

**- likulana..Liber derê dêra,dikabînên telefona da.Û xwarin jî tijî hemü selkên gilêşîye..**

**- selkên gilêşî?!**

**- erê..Heker mirov birsî bû..Heker zik vala bû..Çu pirsîyara nakit,jibilî têrkirina xwe...!**

**- ê..?**

**Paşî ez tûşî hindek hevalên dî bûm,wan jî ez didame şolî.**

**- Şolê çi?Ma tû ne yê nîve mirov bûy?**

**- Ewan mirovên nîve mirov divên.her kesê dirust bit,harî wan nakit.**

**- Ew çi şole wesa?Te çi şol dikir?**

**- Madê çi bit.Firotina dermanka,peydakirina kesên nû,înan ü birina dermanka,ü her tiştê wan divîya...**

**- Dîyare parekê baş didane te?!**

**- Parê çi,halê çi.Heker parên paş dane min,ez dê piştî demekî wan hêlim.Tinê nan ü zik ü hindek dermanik jibû pêtivîya min..!**

**- Û bes?!**

**- Erê.. Û bes.**

**- Ê? Û paşî te çi kir?**

**- Ez wesa Mam,heta ez hatîm girtin,û yadî hün dizanin..**

**- Bibore bira,wek ez dizanim tû kesekê xwandeva ü gelek baş bûy,tû xudan şîyan û pare bûy.Te çewa gohê xwe da kiçeka wesa?Te çewa xwe bû wê kire erd ü benî?!**

**- Her kesê lichê min ba,da tûş bit.**

**- Ji ber çi..?**

**- Ji ber ciwanîya wê,jiber peyvên wê,jiber çavên wê, jiber rêveçûna wê..**

**- Erê..Bila te hind xwe nekrba didesta da,bila te jî yaryên xwe pê kiriban ü hêla ba.**

**- kes nizanit dê çewa tûş bit,kes xwe liber leşê wê Nagirt. Dema xwe rüs dikir.ez jihemü hizira rüs dikirim,dinîya hemü jibîra min dibir,min çu tişt ne didîtin,min tama çu tişta ne dikir.tinê ew leş lipêş çavên min dibû,perstgeh.tinê tama lêvên wê didevê min da tam dida.Ez diketim,xilwê,ez jihizira dihatim şûyştin.ez jihesta dihatim mêtin.ez dihal diçûm. dibûme derwêşekê dîndar.**

**- paşe ma te ne dizanî ew dermanik dê te toş kin?Te çewa hêla?Te bû xwe fêrkir?**

**- Bira,ne wesa ye,wê birêya cigara û vexwarina dida min, min ne dizanî ez çi vedixom.Min tama wan ne dizanî,tinê tama lêvên wê,tinê tama bişkuşkên memkên wê didevê min da bûn....!**

**- Dikirine dinav cigara ü vexwarinê da....?!**

**- Erê..Erê ma ez yê dîn bûm,êkser vexom?Ez kartêkirina wan baş dizanim.**

**- Û hosa tû vêr bûy?**

**- Ez vêrbûm,min daxwaz jê dikir,min hîvî jê dikirin,heta hindek daba min.ew jî liberamberî karekî min bû kiriba.min neşîya xwe liser pîya bigirim,xwîna min hemü bû dermanik.**

**- Başe,pirsîyareka dî birayê hêja?!**

**- Keremke..Belê hîvîye yarîya bimin ne kin..!**

**- Ne,ez yarîya bite nakim.Bawer bike,tû birayekê gelek xoştivî liber dilê min!**

**- ê..?Te çi pirsîyar hebû?**

**- Merema wê çi bû?Bû tû fêrî van tişta kirî?**

**- Gelek merem hebûn.**

**- Wek çi?Ez tênagehim?!**

**- Peyda kirina bikirên nû,peyda kirina para û xûdan para
, berfireh kirina bazara.Dibit ew jî tûşî hindekên ji xwe mazntir bibit..?Da şolên xwe bihevalên nû bikit..!**

**- Şola..?Çi şol pê dikirin?**

**- Heker mirov tûş bû!Dê bite kerê wan.Gelek cara dê barê wî kine dermanik û çek ü pare..Û dê bû hevalên wan bine cihê wan divêt,polîs jî wan hêşta nanîyasin.Heta ew jî bêne nîyasîn,yan girtin,dê pirsîyara hidekên dî kin..**

**- erê bû ew naêne girtin?**

**- kes wan nanîyast!Kes wan na bînit!Kes nizanit ew kîne? Ewên berçav baş nizanin xwe biparêzin.Dibit ew jî diêne berzekirin,ez nizanim?Min divîya careka dî hevala xwe bibînim,lê wesa dîyare livî welatî nehêlaye.Anku ew jî wek min ya bûye qorbanî!**

**- Erê herê..Ez jinû têgehiştim!Karên xwe bimirovî dikin?!**

**- Pa jixwe ne libejna me aşiq dibin?**

**Dîsan her wekü perda şanoyê hatîye girtin,jor bê deng bû, xewê xwe biser jora wanda girt.devê hindeka tijî bawşik bûn,her êk ma lihîvîya hevalê xwe,ka dê çi bêjit?Ka dê kî hindek jijiyana xwe bû wan bêjit?**

**Hevalê wî nevîya azad binivit berî bizanit ka çi ditûrkê wî da maye?**

**Û nuke kak azad?Te çi kir bû mala xwe?Te çi libere?Dê çi kî?**

**Ev pirsîyare,wek tîra dilê wî kun dikin,leşê wî dikine serrad. nevêt kes van pirsîyara jê bikit,nevêt ew van pirsîyara jixwe bikit.yê lihîvîya mirinê,da jihemü pirsîyar ü bersiva rizgar bit.**

**- Min mal ya jibîr kirî..Ez bawerim,wan jî ez yê jibîr kirîm!**

**- Bawer neke,mirov naêne jibîr kirin.nihu wek har ü dîna lihîvîya tene.lihîvîya her tiştekî jite bizanin.eve demeke tû yê berze û bê seruşwîn.Hosa nemîne,madem nihu tû yê başî ü jiwan dermanka rizgar bûy.Bizütirîn dem peyamekê bigehîne mala xwe,da ew jî bes diezaba teda bijîn.**

**Hevalên dî jî gazinde jê kirin.**

**- ez jî pitir jidû sala jimal bê xeber bûm,lê wesa nabit,divêt her tiştekî jimirovî bizanin,çi baş çi xirab.**

**- madê biçi rü xwe bû wan dîyar kim?Dê çi bêjime wan?Dê çewa bersiva pirsîyarên wan dim?**

**- Ew hemü negiringe!Xema wan tişta nexwe,tinê ew bizanin tû yê saxî,tû likîvey..Ew dê pirsîyara te kin.Ew tinê bû wan bese.Ewa dî tiştek bû ü çû.Kes neşêt bizivirînit...!**

**"- tû dê bî ye kesekê nav dar,**

**- te şîyanên mezin hene,**

**- te serê me bilind kir..."**

**Dinav hizirên xwe da xendqî,berze bû,gelek jiwê jor ê dür ket.Jor her ya bê deng dibit,xew ya har dibit,her ew yê dür dikevit,dinaf pêlên hizirada kete dizifirokeka har..**

**Xew jihzira dijwartire,mejyê wî yê westîyay dizî.Liser wî Balîfkê sar nivand...**

**Kuntirola turka,wek mejyê wan yê dijware.alûze,bizorî derbas bû beref Kurdistanê.**

**Nevîya biturmbêla teksyê litûxîbî derbas bit.Çantê xwe limlê xwe kir,ü liser pirê lihndav xabûrî da rê.Xabûr yê har bûy,yê dar û bera liber lêvên xwe tîvil dikit.pêlên wî wek şerê efirta, haha dê wê pirê digel wan dar ü bera dauürit.**

**Her beref welatî diçit,her dinîya lipêş çava ron dibit.Jidûr, dengê dehol ü zirnayê dihate goha.Her lez dikit,her deng zêde dibit,ew lirxê turka ü dayika wî,babê wî,xüşkên wî, jina wî digel her dû kura ü hemü gundîya lirxê dî...**

**Ew bezî..Gondî bezîn..Dehol ü zirna bilind bûn,tilîlî ü kenî bilind bûn,dengê mîrzo bilind bû.lewendyên kiçên gondî bilind bûn.**

**Wek "marasona" xardanê,hemü têkel bûn,ü beref tuxîbî hatin.**

**Ew lirixê dî yê bihemü hêza xwe rê dibirt,ü beref kuma wan diçit.**

**Jidür çavê wî biherdû kurên wî ket.kur dinav kuma mirova da,wek dû qeftên nêrgza dinav destên jina wî da ü ya dibezin beref wî diên.**

**Ew bezî..Ew bezîn,wî kire xar,wan kire xar, linîva pirê,liser lêva tuxîbî gehiştin êk.Hêşta hirêna pêlên xabûrî goha disimtin. Hêşta dehol ü zirna dişarîyay bûn,hêşta mîrzo heyrana xwe bidawî ne îna bû,hêşta tilîlyên dayika wî liesmana difirîn, hêşta her dû kurên wî didestên dayika xwe da dibezîn.**

**Berî xwe pavête ber sîngê babê xwe,berî dayika wî bisîngê xwe ve bişidînit,berî muxtar silav kitê,berî tewîka mîrzo bidawî bêt,berî sîngê xwe yê sar bû herdû kurên xwe bikite kêl.**

**Hemü wek tîpeka hunerî liser pirê rawestîyan,hemü man lihîvîya wan pêlên har yên xabûrî.**

**Xabûr yê har bûy,agir yê jipêlên wî dipeşit,lêvên pirê digel xwe birin,pir bû dû pirt.hemü jorda beref nav pêla çûne xwar..**

**Mîrzo bê deng bû,dayik ü babên wî avê birin,tilîlyên kiça bûne hewar ü qêrî digel pêlên avê jorda çûne xwar.kes nema lipêş çava.**

**Tinê kurê wî yê biçük,ewê hêşta ne dîtî.yê bilêva berekî ve maye hilawîstî,lihndav wan pêlên har..**

**Har bû,dîn bû,hindî kire hewar,çu deng jiber nehat,divîya wek kutireka sipî bifirt,çeng nebûn,çu jê nehat,çu pê çê nebû,neşîya wesa xwe bigirt.**

**Destê kurê xwe girt ü hilkêşa nik xwe ve.Ew pirta berî,ewa libin pîya,sist bû,jicih çû,digel kurê xwe beref pêlên xabûrê har çûne xwarê..**

**Hindî dilê wî yê jar bizav kir,hindî hîvyên wî daviz bûn,jihemü hêz ü şîyana xwe kire hewar.**

**Rast rabû ser xwe,serê wî bibanê textê diser wî da ket,ageh jixwe bû,heval hemü jixew hişîyar kirin.....!**

**(13)**

**- Min birîyara xwe da,ez dê çime jiderve...!**

**Jor bê deng bû,her wekü wî biçükê sava jî hest kirî tiştek ne dirêda hate gûtin.Ew jî bê deng ma!**

**Wê baş merema wî zanî,wê zanî behsê hewşê nakit,wê zanî behsê kulana nakit,wê zanî naçite çayxa ü meyxana.Wê zanî heker ev birîyare bicih hat,eve dawîya xoşyên wê ye. Eve mala wê kavil bû....**

**Xwe tênegehand:**

**- Vê nîv şevê?!Dê çi kî jiderve?**

**Çend yê bê zewiq bû,pitir lê hat.Enîya wî bû girê,zanî ew xwe tênagehînit,zanî ewê nevêt rastîya axivtina wî bizanit, zanî ew baş dimerema wî gehişt,lê xwe xişîm dikit.**

**Berê xwe da nav çavên wê yên mijül birapêçana cilkên biçükê xwe.**

**- tû yarîya bidemarên min dikî?!**

**Serê xwe jinav wan pata îna der,zanî neşêt pitir xwe mijül bikit,zanî divêt liberamberî wî rawestit,zanî revîn ne çareye.**

**- Yarîn çi dilê min?Mate çi gût?**

**- Min gût,ez dê çime ji derve..!**

**- Jiderva kulanê?Yan ewa çûn û ne zifirînê?!**

**- Ewa çûn û zifirînê,ewa bihayê mirovî baş dizanin,ewa dikupika pêşketinê da,ewa gehiştîn ser banê stêra...Te zanî yan bikime hewar....?**

**Rengê wê vêçarê bidirustî hate gihorîn.Zer bû,sipî bû, tezîlanik biser leşê wê da çûne xwar,hişik bû,axivtin jê nehat.**

**Jor bû gorstan,ronahî lipêş çava şêlî bûn.Ew dîwarên biwênên xwe ü yên kurê xwe nexşandîn,pîç pîçe dihatine êk.her nêzîkî êk dibûn,çu nema bû da dinav wan dîwara da perçiqin.**

**Girîya biçükî jiwê tengavyê rizivar kirin.**

**- Te çi goh lê bûye?Kê dilê te hêlaye?Çi jite kêm?Te divêt mala xwe bidestên xwe xirab bikî?!**

**- Eve birîyara mine,eve paşeroja mine.Kesê mav nîne razî bit yan ne!Dê bû mala min xirab bit?!**

**- Jiyana te jiyana mine,paşeroja te her ya mi e,min wek te mav li ser te heye,tû baş dizanî eve ne karê teye,çi jite kême ?Dê jiber çi çî?Te çi divêt?Baştirîn kar yê teye.hemü biserê te sund dixûn.**

**- Hê hê,tû êkê dizanî û ez êkê..!**

**- Tû çi dizanî?Çi tiştê nû liser karê te rü daye?**

**- Kiçê livêrê paşeroj nîne.min divêt xwandina bilind bixwînim "master...Diktura..."**

**- Ma livêrê nînin?**

**- Ne,heker hebin jî ne wek li ewropa ye.Ewên gehiştîne pileyeka bilind ya zanistê.**

**- Û em..?Dê çi lime kî?Em dê çewa jîn?**

**- Hemü çend heyvekin,ez dê hewe jî înime nik xwe,ü em dê pêkve jîn.**

**- Babê te?Dayika te?Mirovên me?Ewê diçavên tera hizar hîvî didîtin?Ma dê vî welatî hemüyê digel xwe bî?!**

**- Mala te,hemü çend salekin ü em dê zifirin.**

**- Başe, kî dibêjit dê te wergirin?Kî dibêjit tû jî wek geleka nakevîye kempa û rezîl bî?!**

**- Ne ne,min têra xwe berdest hene,ez pê biême wergirtin ü libaştirîn zanko bixwînim.**

**Çi bizimara wê qûta,wî çantek pêve kir.Çu axivtin neman berevanîya xwe bikit.Jor bê deng bû,herdû bê kîyan man...!**

**Ew germa dijora wanve,bû serma,leşê wî yê lawaz gezand.**

**Seyê pîrejinekê hizirên wî bin ax kirin,cih gûhart seruber kire rastî.**

**Liwêve hindek biçüka yarî bibelgên dara dikirin.Liser wê textê hercar bêhna xwe vedidit.kiçeka sinêle ya romanekê dixwînit.**

**Dengê livîna mirova,berdewamyê didite jiyanê,roj bû rojê yê hizir ü hestên xwe dicemînit.roj bû rojê yê ligîyanê xwe dibite xudan.**

**Dizanit ka çi hatîye serî.dizanit husa bû wî na çite serî.Divêt hişîyar bit,divêt bizifirte rigê xwe.**

**Kuxî,gelek kuxî..Tifa wî didevî da tama xwînê jê dihat.**

**nevîya biçavên xwe wê xwînê bibînit.çavên xwe niqandin û tif kire wê zembîlka gilêşî.**

**- ev kuxke neya diruste!Her ya dijwar dibit!**

**Gûtinên dixitûrî diserda deng vedidan:**

**- piştî tû jivêrê xilas dibî,herevî dixitûrî.Bila bûte hindek taqîkirina bikin,jibû silametîya te..Tû gelek yê nesaxî,divêt tû baş pirsîyara xwe bikî,û libin çavdêrîya dixitûra dabî....!**

**- nesaxî jimin kême..!Heta ez jinesaxîya dermanka rizgar buym,tûşî êka dî bûm..!**

**Ew rêya dinav wî baxçê mezinda.da bersîngê xwe,hizra jitûxîbê wê baxçê bire der,ageh jidengê wan tulaza nema, ewên yarîya dinav wî gîyayê ter da dikin,ageh jikenîya wan kiça nema.ewên dikuşa yarên xwe da liwê êvare züyê gohnêlyê dikin.hizira bire çîhana xwe.Tinê leşê wî yê may, hizir ü gîyan bûne pelatînik ü firîn nav baxça biçüka,dinîva hewşa wanda,dada ser gulekê.Berî hemüya herdû kurên wî bikenîyeka şirîn qest kirine wê pelatînkê.**

**wî gût bû mine,yê dî gût bû mine.Lihindav serê wî bû şerê herduwa,seruçavên êk dane ber nînuk ü tep ü mstan. Dayika wan litana wan hat.wê jî kire hewar ü gût:**

**- ev pelatînke bû mine.**

**Biçük lê kirîn,wê xwe asê kir,bapîr ü dapîr litana wan hatin. Ew jî sera wê pelatînkê lêk ketin.her êkê divîya bû xwe bibit.**

**Xüşik ü bira hatin,her kesê jimala wan hatî,her kesê ew pelatînik dîtî,bû xwe divîya ü şer liser dikir.**

**Hemü ketin nav êk,wekü şerê qereça.Kesê nezanî hevdijê wî kîye.Tinê daxwaza hemüya pelatînke!**

**Berî kes destê xwe pavêtê û bû xwe bibit.**

**Lipşt wî dengê rawestîyana payskilê tûlazekî hate gûha digel hindek xebera..**

**- beraz,ma tû yê kurey....?**

**Hate ser hişên xwe,leşê wî tijî serma bû,recfikê girt,beref kempa xwe zifirî.**

**- heker ez beraz ne bam?Heker ez kure ne bam?Min mala xwe,welatê xwe ne dihêlan ü ned hatime ber difina te?!**

**Lipişt wî dinîya gewir bû,ronahîya gilopa şer digel tariîyê dikir kitkte xelkî qesta malên xwe dikirin.cade tijî jiyan ü livîne.**

**Dipencerên wan malên liber lêva rê,sînahîya mirova didît. lidür xwarinê,telefizywnê dikumin.kenîya wan jiyan jê diza.**

**Liberahîya wî,tulazekî destê jina xwe girtîye,dû biçük ü seyek wek pelatînka lidûrên wan yarîya dikin.hemü pêkve beref mal diçin.her çendekê dayik ya dibêjte wan:**

**- lezê bikin,da biçine mal.**

**Biçük jiyarîya têrna bin.**

**- ne,em naêne mal,medivêt hêşta yarîya bikin..**

**Bab digel sey direwî,wek pişîka dinewî,xwe dikire ker û Dierî xwe dikire bilbil ü xwe dikire kutir ü lidûr biçükên xwe difirî.**

**Berî wan direvî,lipişt wan dizifirî,xwe berdida axê,her dû biçük diçûne ser pişta wî,sey xwe dihavête dinav kuma wan da.kenîya wan biser hemü dinîyayê diket.dayika wan xwe dihavête kuma wan,pêkve dibûne kevalekê keyivê..**

**Lipişt xwe hêlan diwê xoşîyê da.hind dît yê liber derê jora xwe liwê kempa lipêş çavên wî bûye zîndan rawestîya, heval yê pê dikenin..**

**- dîsan hizira tû kîve birî?**

**- ma tû birsî nabî?**

**– ma tû na wastyêy?**

**Hate ser hişên xwe,serê xwe bilind kir**

**- Min hizir yên mayin..Hewe divêt ez wan jî jidest bidim?!**

**Memo zanî barê wî gelek girane,dibit hizir hindekê jê sivik bikin.**

**- hizir nîşana saxlemîya mejiye.lê bila ne bite nesaxî,hîvîye pitir barê te giran ne kit.gelek cara hizir kirina zêde dibite nexuşî...!**

**Bikenîyeka sivik û bişkurîneka pêtî.**

**- eha ew ya jimin kême!Ez yê kêm nexuşî me!Bila hizir jî bû min bibine êş ü limin zêde bin..!**

**Hevala pêk ve gûtin:**

**-Çi êş lite ne kak azad?Tû jime hemüya saxlem tirî,yan tû xwe nazidar dikî?**

**- Nazdarkirin...Hê hê**

**Bikenîyeka bilind vê carê jiküratîya dilê wî derket.destê xwe wek mîrzo da ber gohê xwe qêrkirê**

**- Hey lû.. Hey lûü....Lawikê gondî..**

**Kenî tijî jora wan bû,lidûr azad kum bûn ü beref wê mêza xwarin liser çûn.**

**Digêleşûka jiyanê da berze bûn…**

**(14)**

**- Te xêre tû nanivî?**

**- Pirsîyareka bê meineye.ez bişev nanivim,dê çewa vê nîvroyê xewa min êt?!**

**- Çi bûye?Bû xewa te naêt?**

**- Rast?tû nzanî çi bûye?**

**- Ne!ez nizanim çi bûye?!**

**- Hema diwî halî da be,ew hal bû te ü ewên wek te hizar cara pîroz bit.**

**- Halê çi?Te ez tirsandim?!**

**- Em yên hatîn binivin,Mane?!**

**- Hû.. Hû.. Dîsa çû wî cihî "ker lê ketî."**

**- Ew cihê ker lê ketî,çucar ker jibîr nakit,lê heta em nekevne beramberî gîyanê xwe,em rastîya jiyana xwe jişaşîya cûda nakin.**

**- Rastîya çi?Şaşîya çi?Mame hindek jiyan maye?!**

**- Erê,hindî em disax bin,divêt em pirsîyara xwe û paşeroja xwe bikin.**

**- Paşe roj..?Ev peyve min ya jibîr kirî.**

**- Paşe roj ne peyve,paşeroj xebate,kare,pilanin,xwe wastandin,xwe libergirtine.**

**- Erê pirofîsur..Em çi bikin da tû razî bî?**

**- Ez ne pirofîsurim,û tû ne dê bû razî bûna min kar kî.Te mala hey,te jina hey,te biçükyên heyin.welate kê hey.**

**Divêt bû wan xwe biwastînî,ü xebatê bikî,jibû paşeroja wan.**

**- Biçi hêz?Biçi şîyan?Biçi hîvî  ü umêd?Biçi gîyan?**

**- Bigîyanê şoreşgêran,bigîyanê xwe gorî kirinê..!**

**- Jinü min jidil bawer kir,tû yê jikartêkirina wan dermanka rizgar bûy,ü tû Mamusta azadê caranî...!**

**- Ne ne,hêşta gelek ya may,heta bibime azadê berê.**

**- ü tû?Te çi libere?**

**- Ez bişev û roj yê hizra dikim,bişev û roj lêgerîyanê dikim,da biser rêyekê helbim,carekadî peywendiyê bimala xwe bikim.**

**- Ê..?Te tiştek bidest xweve îna?**

**- Erê..Ez digel hindek mirovên me axivtim,wan peyam gehande birayê min ü jina min.**

**- Eve gelek başe,hîvî ye zü telefuna te bikin.**

**Bê dengyê jor dagîr kir..Hizira her dû dauran..**

**- dîyare min gelek dilê wan êşandîye,lewa bersiva min hêşta ne dayine..!**

**- bê hîvî nebe!Te nihu digote min,divêt mirov yê şoreşgêr bit ü niza çi û çi..?Tû baş dizanî telefun çend bizehmetn....!**

**- birastî em ne hejî peyva şorşgêrin.**

**- bû?Ma em jî ne mirovin?**

**- belê,em mirovin,lê ma çend mirov licîhanê şoreşgêrin?**
**şoreş ne tinê çekdarîye,ne tinê berhingarîya dûjmnaye..!**

**- ez tê nagehim.Bû min wek têgehiştina min ron bike.**

**- gelek jime şoreşa çekdarî kirin,xwe gurî welatê xwe kirin, derbederî,enfal,kêmîya baran,kuştina tevayî.Lê demê şoreş bûye xudan birîyar ü dewlet,gelek jime dest jê berdan, jiqada xebatê revîn.**

**- erê bira,nê gelek jime çu pê çê ne bû,neşîyan gihorîna bikin,neşîyan şaşîya bibînin û bê deng bin!**

**- erê raste, şoreş hêşta ya berdewame,hêşta me gelek maye,em xebatê bû bikin,û şaşî birevîn û destberdanê çareser nabin,tinê biberamberyê ü dijrawestîyanê diêne çareser kirin.**

**- birakujiyê rolekê serekî hebû,gelek jigorepana**
**xebatê dür ketin.**

**- dîsan dibêjim,dür ketin ne çareye.Divêt em dan bişaşyên xwe bidin.Welat pêtivî me bû,û nihu pitir pêtivî me ye...**

**- wesa dîyare,tû yê karê zifirînê dikî?!**

**- zifirîn..?Zifirîn peyveke neşêt hemü ramana xwe hilgirt. Bawerbike rojek dê biser meda êt,ka çewa me qaçaxçî girtin û em revîn.wesa em dê qaçaxçîya girin û zifirin....!**

**- ka ew roj?Xozî ew roj hatiba,bila roja dawîya jiyê min ba...!**

**Qotana dergehê jora wan,her dû jizifiroka hizira rizgar kirin.**

**- Azad,azad telefun.hindek yê pirsîyara te dikin...!**

**Eve pitir jiçar salaye kesê pirsîyara wî ne kirîye,wek sivorekê zîrek,xwe jitextê xwe havête xwar,pêxwas ü nîv rüs,qesta cihê telefunê kir.**

**- Helo, helo....?**

**- Azad,azad eve tûy?!**

**- Erê ez azadim,tû kî?!**

**Gelek gîro bû,şev biserda hat,bidüv serê xwe ket.Ew bajêr hemü têkveda,çend filsek diberükên wî dabûn,dane bişirînayî ü bû hevala înan.Wek birayê zavay bidewat ü stiran ü kenî ve hate jor.Eve sê çar salin hosa ne kenîye.eve demekê dirêje wî keyif nekirîye.seruçavên wî kenî jibîr kirîye. hevalên wî man hêbetî?!**

**- xudê xêr kit?!Te çi goh lê bûye?Kenî ü dewat,Şirînayî?!**

**Eve dîyare tiştek gelek xweşe?!Neku te careka dî dest bidermanik û meyê kiribit....?!**

**- ne,ne,ew roj çûn ü çu çar naêneve.Tiştek gelek jikartêkirina tirîyakê dijwar tire....!**

**- Ew çî ye babû?!**

**Dû sê cara bileyizik lidûr xwe zifirî û bî şeq şeqa tilên wî..**

**- Mala min telefun kirin..**

**Hemüya pêkve kirine hewar ü kenî.Xwe havêtine nav sîngê wî û bigermî pîrozbahîya wî kirin..**

**- tû bixudê?Wela eve tiştek gelek baş bû,mizgînîyeka gelek xweş bû.**

**- ê?Bêje,hewe çi gût?Kî hatibûn?**

**- birayê min û jina min û herdû kurên min..**

**- xudê jiyê wan dirêj bikit,ü liber sîngê te mezin bin.**

**Bê deng bû,rengê wî zer bû,hevalekî zanî hizirên wî jitüxîbê jora wan derketin.**

**- Xêre..?Ma tiştek bûye?!**

**- Ha...?Ne,ne..Çi ne bûye.**

**- Pa te xêre?Bû wesa dür çûy?**

**- Kurê min daxwaza payskilekî jimin dikir,û digût,tû bû naêye mal?Hevalên min hemüya payskil ü bab yên heyin.Min ne payskile û ne babe...!**

**Kenî û hêbetyê devê hemüyan tijî kir,lê her zü jora wan bê dengîyê hişik kir..**

**(15)**

**Gundî hemü yên lêk kum bûyin.cihê azad yê valaye birex jina wî ve.hindek cara her dû kurên wî lichê wî dirünin,lê jiber yarîya,carekadî vala dikin.**

**Cihê babê wî,birayê wî yê girtî.wek zarvekerekê şareza.rolê babê xwe digêrit,wek wî rüniştîye ü tizbîyên wî her çendekê dibite şeqêna wan.**

**Muxtar,haha dê jihêbetîyada peqit..!**

**- Kurê min,tû bixwe digel axiftî?!**

**Berê xwe da jina wî,her ew pirsîyar ji wê jî kir**

**- Û tû?Tû digel azadî axiftî?!**

**Wek babê xwe divîya xwe ragirt,û bersiveka giran bidit,lê jina azadî neşîya xwe ü diber rakir..**

**- erê muxtar,em digel axivtin,gelek silav lihewe hemüyan kirîne, dest û çavên hewe hemüyan maç dikit..**

**- pa likîve bû heta nihu?!**

**- me neşîya gelek pirsîyara jê bikin,wî digût,ez tûşî belayeka mezin bibûm..!**

**- Dê kengî zifirt?Ma na ête ve?!**

**- Belê..Dê zifirt,dê seruberê xwe dirust kit.başî dê**

**Zifirt..!**

**Birayê wî dû sê cara tizbyên xwe lêkdan û berê xwe da muxtarî**

**- Zifirîn neya bisanahîye,wî gelek kar hene,hizar tişt lihîvîya wîne.ma dê çema hemüya hêlit û bisanahî êt?!**

**Mîrzo jibê dengîya xwe derket:**

**- eve çar pênc sale likîve bû?Pirsîyara kesê ne dikir.Ew çi kare wesa em hemü jibîra wî birîn?!**

**Her kesê jigondîya divîya hizar pirsîyara bikit,hemüya divîya rastîya vê çîrokê bizanin,lê jina wî tinê divîya digel hizirên xwe bifirit beresmana,biçite dîwana wî.liber tenişta wî. Gelek cara mejyê wê jitüxîbê gondî derdiket ü lirojên zankoyê dibû mêvan,lê wan her dû biçükên wê çu xweşî bû hizirên wê ne dihêlan,her çendekê daxwazek dikirin.car dibû şer ü qêryên wan.**

**Şev û nivîna sar,dilê jar kire mêvanê leşê xwe yê har...**
**-helo azad,ka tû?**

**- Helo,ez eve me,ma te ageh jimin nîne?**

**- Were, tû çi dikî?**

**- Kîve bêm?Nê ez yê linkte..**

**- Ka tû?**

**- Eve,ez lipşt te..**

**- Herê..?Pa bû em bitelefunê digel te daxivin?!**

**- Niza?Te telefun ya kirî!Dîyare tû gelek ya jimin xerîb bûy?!**

**- Ez haha dê dîn û harbim!**

**Telefun havêt,destê wî girt ü kêşa dinav nivîna xwe da..**

**- Bîra te diêt,lişeva zavatîya te**

**- Ma kesek heye wê şevê jibîr bikit?!**

**- Nê zavatîya te,jiya hemüya cûda bû!**

**- Erê, jiber büka min jiya hemüya ciwantir bû!**

**Kenîya wê jinav nivîna wê derket.kenî bilind bû,her dû biçük jixew hişîyar kirin.**

**- Libîra te ye?Te digût ez dê ev şeve te xom?**

**- Nê min tû xwarî..**

**Kenî her bilind bû..**

**- Te ez xwarim?Pa eve çî ye nihu dinav destên te da...?!**

**- Ew parçeka dilê mine..**

**Wek marên evîndar xwe têk hüsîn,dengê gohnêlîya wê tijî jor bû.kenî bilind bû.axiftin zêde bû.xew jiher dû biçüka revî.**

**- Dadê?texêre? Tû digel kê dikenî ü daxivî?!**

**- Ha..?Ez digel babê hewe daxivim..Zü binivin..!**

**- Ka babê me?!**

**- Eve ye liber sîngê min...!**

**Balîvik bisîngê xweve şidand ü her dida ber maça. dikenîgirîya xwe da dixew çû.**

**Lirexê dî yê cîhanê,azad dinav nivîna xwe da yê bûye zava.**

**- Ev şeve ez dê te xûm..!**

**- Ma te ez bû şevekê bitinê înayme?!**

**Kenîya wî her sê hevalên wî jixew hişîyar kirin**

**Lidûr cihê wî kum bûn,zanîn yê didinîyayeka dî da dijît..**

**- Tû hemü jiyana minî,tû dawîya hîvyên minî..**

**- Ne,hîvî hêşta gelek yên mayin.**

**- Min çu hîvî nemayne,piştî ev şeve biser min da bûrî..**

**- Pa ka master?Ka dikutura?Ka biçük? Dû kur dû kiç...?**

**- Ew hemü hîvyên biçükin,hîvîya mezin ev şeve bû û biçih hat!**

**Kenî bilind bû,suhbet şarîya,birazava yê bileze.**

**Balîfk liber sîngê wî şidîyaye.her çendekê didite ber maça û her bisîngê xwe ve dişidînit.**

**Xew jihevala verevî,heval hemü bûne birazava,man lihîvîya wî.azad dikenîgirîya xwe da dixew çû..**

**Sipêdê zü,hersê hevala wek birazavay liber textê wî rawestîyan.**

**"- Me jinü zavakir..Me jinü zavakir**

**Kaku azado..Me jinü zavakir..."**

**Rabûne dewat û leyizukê liber textê wî.**

**- Xêre..?Hewe çi goh lê bûye?Dê hema bêjin sipêde baş..**

**Tilîlî ü stiran ü dewata wan tijî jor bû.**

**- hizar cara sipêde baş,sersubehîya te pîroz bit,ha,ha,ha...**

**- Dê min jî têbigehînin,da ez jî dewatê bikim?!**

**- Zava dewatî nakin,hilû serşo amadeye,zavayê delal..**

**- Zava..?Serşo..?Hün dihêcin?Didînin?**

**- Şivêdî tû zava bûy,me filim hemü dît ü goh lihemü tişta bû..**

**- Birastî..?Hewe rastî divêt..?**

**- Ne hewceye,me hemü biçavên xwe dît ü bigohên xwe goh lê bû.**

**- Her wekü şeva zavatîya min dûbare bûy.Bawer bikin,min qet hest nekir ku xewine,heta berê sipêdê, hemü tişt berze buyn,bûne xewin.**

**- Dê hilu,serê xwe bişo,were têşta zavatyê bixo.**

**willa babû hün diheqin,birastî ez bibüm zava.**

**Bikenîve jiser şoyê derkit..**

**- erê zava tene gote me?Birayê te,jina te,çi digotin?Çi heye liwelatî?Çi bûme dibêjin?**

**- dixewinê da..?Yan ditelefunê da..?**

**Kenî tijî jora wan bû..**

**Paryê nanî jidesta ket,serê xwe bilind kir,bêhneka kür hilkêşa,hizra gelek dür bir..**

**Memo zanî vê pirsîyarê jihestiyê wî girt.**

**- bibüre kak azad,hîvî ye min çu bîrên ne xweş ne înabne bîra te.Heker te nevêt bêjî,tû azadî..**

**- ne,çu tiştên veşartî nînin,lê welat yê bûye biheşt.Em livan kulana wek pepüka dijîn,liber derê karîtas û dêr ü rêxirawên**
**mirovayetyê.eve ne jiyane em dijîn..**

**- Welat bû ewên pare û kursîk heyin biheşte,ne bû hejara..!**

**- Ma xelkê Kurdistanê hemüya pare û kursîk hene?Nihu kar û tenahî peyda bûye.her kesê zîrek bit,dê şêt xwe xudan kit!**

**- Û dê hêlin mirov bitenahî bijît....?**

**- Bû nahêlin...?! Kê ageh jite heye?!**

**- Ma em jiber çi hatîne vêrê?**

**- Ji bê omêdî..**

**- Ne,ez yê bû xweşîya xwe hatîm**

**- Lê hindek jibirsa..Hindek jitirsa hatîne..**

**- Û tû? Tû jiber çi hatî kak aso?**

**- Çîroka min dirêje...Ez yê revîm jiber şerê birakujyê.min neşîya xwe xudan kim,û nevîya birayê xwe bikujim.Revîn tinê çare bû..**

**Kenî ya saman ew dîmenê xemgîn berzekir..**

**- Hün dizanin..?Ez jî yê jiber şerê birakujyê revîm..?Û birayê min,ewê da min kujit û ez da wî kujim,di êk kartûnê da bûn? Ewa dibinê wê kemîya mezin,ewa diderîya îce da û ez û dujmnê xwe pêkve revîn û digel êk gehiştin yunan ü em pêkve gehiştin Ewropa ü em ketin diêk kemip ü nihu em pêkve ne ü diêk jorda û gelek şeva liser textekî nivîsitîne. nanek pêkve xwarîye....?!**

**Berê xwe da nav çavên hevalê xwe,ewê eve pitir jiçar sale pêkve wek bira dijîn,destê xwe liser stoyê wî werand û maçek lenîya wî da..**

**Neşîya xwe,tijî gewirîya wî girî bû.**

**Azad girîya wî bikenîyeka bilind berze kir:**

**- Eve filmê hindîye..Dû bira dibine neyar,her dû bidinîyayê dikevin,ü litengavîya digehine êk û har êk dikin.Hah,aha... Kenî jidilê hemüya bilind bû..**

**Hêşta deng vedana kenîya wan tijî tîkên jora wane.**

**-ü tû kak memo...?Me çîroka aso ü saman zanî?Çîroka te çîye?Tû jiber çi hatî?**

**- Çîroka birayên dujmin.birastî linik min neya seyre.Jiber her dû kesên jiwelatî revîn,dirêya revêda dibine bira.Jiber ku wan çu dujmnatî digel êk nîne ü ne bûye,lê liwelatî xwîna êk firdkirin,jiber berjewendîya kesayetî.Her dû dujmnên êk bûn,lê cihê pirsîyarêye.bû her dû pêkve dujmnên min bûn?!**

**Hemüya berê dane êk,ü paşî berê xwe dane memo..!**

**- Tinê em dujmnên sedam bûn..!Matû sedamî..?**

**Kenîyeka sar bilind bû.**

**- ne,hewe jimêje sedam jibîr kirîye.Hewe gelek tişt jibîr kirîne, tinê kursîk û pare libîra hewe mayne...!**

**- erê te ne gûte me,tû çi rêkxistin bûy?**

**- Ez rêkxistina hejar û pala bûm.**

**- Ha.. Kumunîst.**

**- Kumunîst bim.Îslamîst bim.Ma hün na bêjin,em dîmukirasîne.û azadîya hizir ü bîraye?**

**- Erê azadîya hizraye,kesê rê lihewe ne girtî ye..**

**- Pa şerê hewe liser çi bû...?**

**- Ew roj çûn,ü hîvîye çu çar dûbare nebin.!**

**- Erê,hîvî ye ew roj bibine xewin û berze bin,lê hîvîya mezin ewe, egerên wî şerî jî bibine xewin.**

**Memo neşîya xwe,kenî biser axiftina wî ket.**

**- Raste şerê germ nema..Lê şerê sar hêşta yê şarîyaye..!**

**Hün dizanin?Ez jî digel wî karwanî bûm,û diwê wê gemyê da bûm,ewa hün têda.Ez jî digel hewe heta yunanê hatim, gelî birayên dujmin...!**

**Suhbeta wî bikenîyeka ter bidawî înan.**

**Azad gût,piştî vê carê jidil kenî..**

**- eve ne filmê hindîye, eve filmê kurdîye...**

**- Bû her tiştekê ne yê rast û ne beraqil bit,em dibêjnê filmê hindî?Hind milîyareka mirovaye,bihizareha milletin, bihizareha dîyanetin,bihizareha partiyên sîyasîne,bisedan hizara aydulujî ne.**

**Lê êk welat,êk xak,êk ala,êk hukmet ü êk hîvî ü armancin!**

**Nihu bizanist ü zanînê xwe gehandîne ber perên esmana, ü dinîya hemü bû hizar hizra dikit...!**

**Em...?Me çi heye..?Em milletekin,sernivêsa me hindî gondekê hindêye.Em êk millet ü êk ziman ü êk dîn ü êk armanc ü êk paşeroj..Lê çend berjewendî,çend ala,û dû desthelat,ü dû hukmet ü dû perleman.jiblî wan parçên heta nihu neşên bizimanê xwe baxivin.Nabit em xwe bînine rêza hindîya,em tinê wek xwene.dibit kew jî wek me bit,jiber liçîyayên me dijît...!**

**- Malate..Te çi lime kir?Em jî milletekê xodan mêjo ne.mejî têra xwe zana û aqildar hene..**

**- Zanîn ü aqil çewa limirovî dîyar dibin?!Ez dê bersiva xwe jî dim..**

**Ew milletê êkgirtina xwe neparêzit.ew milletê zana ü xwîndevanên xwe ne parêzit.ew milletê mavê xelkê xwe ne parêzit.ew milletê mavê şehîdên xwe neparêzit.ew millet ne hejî jiyanê ye..**

**- kî dibêjit milletê me van hemüyan na parêzit....?!**

**- Bira kujî we dibêjit..**

**- Bira kujî nema..**

**- Heta kengî..?!**

**- Heta heta.. Û bû zanîna te,milletê me gelek jivan tiştên te gûtîn ne jiwelatên dewrubera kêmtire,lê hûn ev biraderên hizir çep.dinîyayê wek xewna dibînin..!**

**- Parastina mavê welatîya ne xewne,êkgirtin ne xewne, zanist ne xewne,her êk lichê xwe û lidüv şîyanên xwe ne xewne...**

**- Em yên dinav gurga da,ü şoreş hêşta berdewame.**

**- Eve hêceta hemü bîrcewazîya û nasîyunalîsta ye.**

**- Nihu te çi divêt?Serê me lê bû êş.**

**- Min divêt,em wek êk bijîn,azadî,dadiwerî,wek hevî.**

**- Bes...?Eve ne daxwazyên te?!**

**- Û kes çu çara ne bêjit filmê hindî,eve filmê kurdî ye...!**

**Kenî bilind bû,lê her wekü dilê wan,mejyê wan.Kenyê qebül nakin,herzü şînwarên wê kenyê bûn Hizir,bûne enîyên girê..**
**- eve demekê dirêj bû,em jivan suhbeta dür bibûn,hîvîye eve dubare nebit,bila dilê me bes tijî xwîn bit.**

**- erê raste...Hün naêne derê...?**

**- Çi heye liderê...?!**

**- Eviro senterê bajêrî dê tijî mirov bit,eviro roja derkirina sihirebend û şeytana ye.Her sal livê rojê vîstevala serketinê liser mirovên xirab digêrin..!**

**- Erê,bila ew sihirebenda û mirovên xirab bikine der.Û em zana û xwêndevana bikine der..!**

**- Mame çi gût?Bese,behsê filmê kurdî nekin.**

**Ew bajêr tijî mirove,her hindeka birengekî xwe xemilandî ye. Hinda xwe kirîne sihirebend,hinda xwe kirîne şeytan,û hind dizin û mirov kujin..**

**Liberamberî wan hindeka xwe kirîne fêrs û pelewanên bajêrî..**

**Birengekê şanogerî vîstevala xwe birêve dibin.Xelk temaşa şerê fêrsên bajêrî digel wan xirabe mirovan dikin.heta jitüxîbê bajêrî dibine der.**

**Dibite keyiv ü dest qutana xelkê bajêrî.**

**Hindek şirînahî û yarîya biser biçük û mezina da belav dikin liser lêvên cada tijî mirov ü taybet biçük,eviro roj roja wane, her êk ji wan tijî turkê xwe şirînahî û yarî kirîne.Bajêr direnga ra berze bûye,keyiv ü xweşî ya dibart.kesê ageh jikesê nîne, her êk tinê ageh jixwe heye,jixweşîya xwe heye..**

**Heker mirov pirsîyara xelkê vî welatî hemüyan bikit,û bêjitê navê serokê hewe çî ye?**

**Pitir jinîva wan dê xwe turekin û dê bêjin,ew ne xema me ye!**

**Lê heker tû navê roman nivêsekê emirîka latînî bêjî.ew dê navê sê çar romanên wî bêjit....!**

**Libin Balîfkê her pîrejineka welatê me,belavokeka partîyekê ye.liberşütka her pîremêrekî radîoyeke.her mala dû kur têda bin,navê şehîdekî yê liser êkî.Her pirsîyareka ramîyarî bête kirin,dê hizar bersiv bû êne dan,dê hizar rê ü çare bû êne dîtin,dê hizar bisipûr bû peyda bin.**

**Lê dema pirsîyara xwêndekarekê zanko yê bikin û bêjinê Ehmedê xanî kî ye....?**

**Dê bêjit..Peykere...!!**

(16)

**Deng bilind dibit,dükêl nêzîk dibit,qêriyên biçük û jina bilind dibin,bêhna dükêlê her dijwar dibit.dengê tup û firoka her nêzîk dibit.**

**Dinav nivîna xweda yê maye asê.nivîn yên buyne çeper.**

**Dujmin nedîyare.cihê revê ne dîyare,çekê didestîda vala ye,heval hemü dixeweka giranda ne.**

**Her deng bilind dibit,her dükêl tijî difina wî dibit.Gohên wî jiqêryên jin û biçüka bûne kanîya xwînê.Dengê tupa xanî hejand.firoke tijî serbana bûn.**

**Mirin wek polîsên diktatura likulana fîtîya ligîyanê biçüka didin.**

**Dinav nivîna xweda yê girtîye,qeyddare,çu jê naêt,çekê wî tinê dû çavên zilin.fîşekên gewirîya wî nemayne.deng jê naêt.pêstirkê yê girtî..**

**Deng jiber pîya hat.agir yê bidehmena daya wîve.rîhên babê wî kuzirîn.**

**Ew firokên tijî esmana,wek volkanê dinîya hemü kire Agir û xwîn,baraneka şîn jê dibarî.esman dîyar nakit jifiroka.her kesê çipkeka wê barana şîn vê ket.leşê wî wek befira liser pela dihelyêt.**

**Lidawîya wê vîstevala mirinê,ew hemü firoke liesmana**
**bûne êk firoke.esman hemü bû zikê wê,ew zik wek seradê kun bû.barana şîn wek tavyên bihara jê dibarî.**

**Her sê birayên wî,wek sê şemalika pêkve helîyan,digel her sê xüşka têkel bûn ü bûne peyker..**

**Babê wî çav lê zil bûn,bêhn lê teng bû,wek kura likelexê dayika wî digerîya.da liber tenişta wê binivit..**

**Deng her bilind bû,divîya bikite hewar,divîya bikite gazî, divîya ditana wan biçit,divîya birevit..**

**Nivînên wî bibûn daralînik,dest û pên wî girêda bûn.çu jê ne dihat.**

**Lihndav serê wî,sîlaveka wê barana şîn jibin zikê wê firokê jorda hate xwar.goştê leşê wî digel yê xüşik û bira ü dayik û baba têkel kir.Berî herdû çavên wî jiserê wî birevin,bihemü hêza xwe kire hewar..**

**- Heware.. Heware..**

**Wek har û dîna serê xwe lidîwara dida.**

**Her sê hevalên wî xwe jitextên xwe havêtine der û jor ron kirin.**

**- Aso.. Aso, rabe,hişîyarbe,texêre?!**

**Destên wî girtin da xwe ne êşînit,lê hindî ewa biçavên xwe dîtî ya kirêt bû.qêryên wî biser wê kemipê ketin.heta tijî devê wî kev bûy.her sê ya neşîyan dinav cihê wî da bihêlin.**

**Hevala dilê wî ü enîya wî perxandin,hindek ava tezî linav çava kirin,wek mirîyekî kete ser cihê xwe..**

**Jorbê deng bû,her wekü ew mirovên diwê jorê da,jigorî kêşayne der.rengê hemüyan zer û pêtî bû.**

**- Bê lume!Ya wî biçavên xwe dîtî.kafir ne bînin...!**

**- Erê..Pitir jipênc hizar mirov hatin sotin,pitir jisîh hizara heta nihu dimirin.**

**- Babê wî,dayika wî,şeş xüşik ü bira.lipêş çava,çav lê zîq bûn,ma eve kême..?!**

**- Heker wî nekirba hewar,heker wî hün hişîyar ne kirban...**

**Ez da hewe hişîyar kim biqêrîyeka ji ya wî dijwar tir...**

**Her wekü aveka tezî linav çavên hemüya kirîn.**

**- Te xêre kak saman...?!Rengê te jî yê pêtî bûy..?!**

**Yê dilerzit,xuhê leşê wî yê ter kirî.çav diserîda dizîqin,müyên leşê wî wek bîstê jijî yên tîj bûyin.**

**- şeq şeqa seqatên girtîxana ebuxirêb serê min hêr kir.kit kite hevalên min lipêş çavên min ser jê kirin,nînukên wan bikêlbetana hilkêşan.Her razî ne bûn,lipêş çavên me hemüyan,kiç kirêt kirin,dayik rüs kirin,bab û bira kahireb kirin...**

**Min neşîya xwe ragirim,min neşîya xwe liber van rengên eşkencê bigirim.**

**Çavên min neşîyan wan hemü dîmena bibînin.Gohên min neşîyan hewar ü qêryên wan jin ü kiça qebîl bikin.dilê min haha da peqit,dengê min da biser kevit.**

**- eve çi bû...?Ev şeve,ne şeva xêraye,ev xewnên kirêt lihewe hemüyan bûne mêvan!**

**- Ev xewne,netinê ev şeve bûyine mêvanên min!Belku her çend şeveka carekê mêvanên minin.lê ez zü hişîyar dibim ü ez kêm cara dikime hewar wek birayê xwe aso.**

**birastî min nevîya kes vê çendê bizanit!**

**- Bira,eve ne tiştek şerme!Ewa hatîye serê milletê me neya kême?!**

**- Pêkulê bikin jibîr bikin,eve demekê dirêje biserda bûrî,ew rijêm nema,dinîya nihu tenahîye.jibîr bikin,da hün baştir bijîn.**

**- Xoştirîn lezeta xodê,jibîrkirine,ma em heznakin jibîr bikin?! Lê ne bime ye.**

**- Madê çewa aso jibîr kit?!Jibnemala wan tinê ew yê maye sax.ew jî nîve mirove.Hemü lipêş çava bixerdel ü sîyanîdê hatin sotin.**

**Maya hatîye serê helepçe kême..?!Em dê çewa enfal û helepçe ü kujtina tevayî ü sotina gonda jibîr kin?!**

**Jor bê deng bû,aso dixewa xweda wek mirîyekî bê gîyane, saman kete ser cihê xwe hêbetî û bê hêz,azad dinav hizrada haha dê xendqit.**

**Tinê memo dinîva jorê da dihat û dicû.**

**- erê,herê,eve halê hewe hemüyane?Min hiriz dikir ez tinê wek dîna hevalê van xewnên kirêtim?!**

**Her duwa serê xwe bilind kirin,wek mendehoşa birê xwe dane memo..!**

**- ma eve diête serê tejî..?!**

**Bikenîyeka sivik**

**- erê..Bawerkin,ez gelek şeva jitirsa wan xewnên kirêt nanivim,min nevêt çavên min bikevne ser êk jitirsa xewneka dirindeda..!**

**- hema tû hişbe..!Tû jî ya xwe nebêje,bila dilê me bes tijî xwîn ü kul bit.**

**- Jibîr bike,xwe fêrî jibîr kirinê bikin.**

**- Erê kak azad,ewa hatîye serê te,tû dişêy jibîr bikî?!**

**- me dû helbjar yên heyin..!Jibîr kirina ya bûrî..Yan jibîr kirina ya bêt anku jiyanê..**

**- Te çi helbijartîye?!**

**- Ez yê bihemü şîyanên xwe kar dikim,da ya bûrî jibîr bikim.. Lipşt xwe bihilim..Careka dî jidestpêkê bijîm..!**

**- Erê tû dê şêy..?!**

**- Ez bawerim dê şêm.Min gelek asteng derbazkirîne,ez ji nîva rê bûrîm berev pêşve..**

**- Ev çende lite dîyare.hîvîya serketinê bûte dixwazim..!**

**- Lê divêt mirovî bawerî bipaşerojê hebit,bêhneka fireh ü dan bişaşyên xwe bidit,da careka dî tûş nebit.**

**- Memo..? Memo yê xoştivî çi dibêjit?Me wesa hizir dikir,tû mirovekê kumunistî,ü kumunista bawerî bixudê û kitêb û pêxembera nîne..?Û ji agirê qîyametê na tirsin..?Pa ew çi xewnin tû jê ditirsî..?**

**Bikenîyeka bilind û serê xwe hejand..**

**- Hewe carekê dîtîye,yan goh lê bûye?Xudê yan pêxember yan milîyaketek ji esmana hatîye xwar û gunehbarek siza day?!**

**Gelî bira..Her mirovin deshelatdaryê liser erdî dikin,ü ez bawernakim,kes jixudê bitirst..!Her kesê bitirst,ji hevalê xwe, yan jizordarekî ditirst!Jiber her kesê dijiyana xwe da çu**

**şaşîya ne kit,ma dê bû jixudê tirst..?!Xudê dibêjit hün şüna minin liser erdî...**

**- Erê, lê kes nîne bê şaşî..**

**- Berî her tiştekî,divêt em bizanin çi tişt dişaşin..?Û kê heq heye bişaşî bidite nîyasîn?Û bi çi mav ew kar wek şaşî diêne hijmartin....?**

**- Bira..Şaşî ji erd û esmana dîyare..**

**- Nexêr..Gelek tişta ez rewa dibînim,lê tû bişaşî dihijmêrî..!**

**Azad yê dinav hizirên xwe da berze bûy,jihindav serê hevalê xwe aso na çit.Digel bêhna wî,bêhna xwe dihilkêşt. her çendekê destê xwe didante ser enîya wî,car jî xoha enîya wî wek dayikeka dilsoz zuha dikit.Didilê xweda hizar awaza dibêjit.**

**- eve paşe roja me hemüyane,em dê husa bê xudan mirin. kes nabit liser kelexê me bigirît.**

**Dengê wî biser lêva ket,ew suhbeta dinavbera memo û saman da birî..**

**- Divêt her bizifirim,divêt ez livêrê nemirim..!**

**Herdû man hêbetî,berê xwe dan nav çavên wî,zanîn neliser hemdê xwe ye,zanîn tinê kelexê wî yê linik wan.**

**- Kak azad..?Kak azad te xêre....?**

**- Divêt em hemü bizifirin welatê xwe.Em çi dikin livan kulana?Em şerm ji xwe nakin.ma em şerm jimalên xwe jî nakin?!**

**Serê her duwa şûr bû,şerm ji nav çavên wan dibarî, nedivîyan wesa xwe bê hêz bibînin.**

**Dengê memo ji lêva derket,lê birengekê şermîn.**

**- Ma kê nevêt liwelatê xwe bijît?!**

**Azad hêşta yê digerma torebûna xwe da dihelyêt.**

**- Em direwa lixwe dikin,her çewa bit welatê me baştire. Nepasport ü ne kar ü ne çarekê lime dikin,em lihîvîya çi ne? Ha..?Kî dizanit lihîvîya çî ye?!**

**- Tû rast dibêjî,lê ma dê çewa zifirin?Me bihayê nanekê pare nîne!Dê çi bêjine malên xwe....?**

**- Ma tû nihu çi dibêjîye wan?Çi direwa bû wan dikî?Û demê tû hatî,te çi gote wan?**

**Saman bidengekê bê umêdî ve:**

**- Ez dizanim dê çi bêjime mala xwe!Lê dê çi bêjime deyndarên xwe..?!**

**- Ez ne wek te me,min çu deyn nînin.Tinê deynê liser milên min,ü leşê min dixot,deynê mala mine,jina min,biçükên min. goneha wan dayik ü babên mirîn û dîtina min bû wan bûye kul ü ma didilîda.**

**Axînekek jimemo bilind bû:**

**- deynê hejarên welatî hemüyan liser milên mine,min çu pê çênabit bû wan bikim,ne livêrê ü ne liwêrê.ü ew gotin û peyvên me digûtin,hemü bûne xewin.**

**Azad hate ser hişên xwe:**

**- mirovê roşenbîr divêt çu çara bê hîvî nebit!**

**- Ewa hatîye serê min,ez jihizir û bawerîya şüştim!**

**- hün bixodê kin,xwe jiramîyaryê dür bêxin.Behsê wan tişta nekin,ewên em jiber revîn!**

**- Ez ü bara pitir ji ewên hatîne derê,ji ber kesê ne revîne!**

**Û çu layena ne rahêlaye me.Tinê xwe perstina me bû,em tûş kirin,gerîyan lijiyaneka xweştir,bêy westîyan.**

**medivîya para kum kin,bidilê xwe bikevin,jin û jiyanê biçerînin,û püçatîya jî rolek hebû dihatina geleka da...!**

**Saman axivtina wî birî:**

**- Bawer bike kak azad,ez jiber silametîya xwe hatîme,ez yê revîm..**

**- Nihu ew eger neman,dê bizifire..!**

**- Nê hizar egerên dî ketin ser,deyndarî gelek jibirakujyê nexweştire.ew jî rengekê birakujyê ye....!**

**Aso xwe qulpande ser tenişteké ü çavên xwe vekirin**

**- hewe xêre....?Hün bû nanivin....?**

**Her sê ya berê xwe dan aso û bişkurînê lêvên wan nexşandin:**

**- Em dê nivin..Mame çi maye jibilî nivîstinê..?!**

**- Şev baş..**

**- Şev baş..**

**Jor tarî bû,bê deng bû,lê dil her man hişîyar,mejî her man dizifiroka jiyanê da ne nivisitî...!**

**"- Sê roj bu te mûlet,tû parên me peyda nekî.dê gîyanê te bihayê wan para bit..Piştî sê rojên dî,dê te kime pare..!**

**Sê roj,dê bi sê roja jikîve wan hemü para peyda kim....?**

**Bisê roja ez neşêm nanî bû xwe peyda kim..Dê çewa wan hemü para peyda kim....?**

**- Ez nihu yê dürim jiçavên wan,ew cihê min yê nü nizanin,ez yê berzeme.**

**Lê heta kengî?Paşerojê dê kîve çim?Dê çewa carekadî xwe veşêrim?Evê carê jî min navê xwe gohart,kempa xwe gohart,ma dê çewa bû min husa çite serî?**

**Jiwelatî revîm jiber birakujyê.nihu jiber deyndara dê kîve revim?!**

**Eve çi hate serê min?Birakujî nema,deyn dê heta kengî mînin....?!**

**Ez dê heta kengî yê veşartî bim?**

**Xewê dilê saman xaf kir,lê her çendekê dengê xodanê para diserîda deng vedida..**

**Sê rojên dî..Pare..?Yan gîyanê te...?"**

**Dengê qutana dergehî,hemü jinav pêlên xewna qurtal kirin, qutana dilê wan zêde bû,hizra birine rojên enfal û polîsên dujmnî lidemê nîv şev ü berê sipêda,dergeh dişkandin û dihildane jor,bê tirs û destür..**

**Her çar rabûne ser xwe,wek har ü dîna qesta dergehê girtî kirin..**

**Sê çar zirtulazeka hildane jor û qesta cihê saman kirin**

**- tû biçî ye ber esmana,tû bizifirîye dizikê dayika xwe da, jiber me qurtal nabî...!**

**Hevalên wî man hêbetî**

**- Hewe xêre..?!Hün kîne?Hewe çi divêt jisaman..?**

**- Me gîyanê wî divêt..!Heker evro parên me hemüyan nedit!**

**- Parên hewe..?!Parên çi?**

**- Bila ew bêjit,parên çi..!**

**- saman,eve kîne..?Û çi jite divên?**

**- Wek hewe goh lê bûy,ez deyndarê wanim,eve gelek cara min xwe veşart,lê ez rizgar nabim.**

**- Hilû..Karê xwe bike,dê digel me êy..**

**- Dê kîve bin..?**

**- Ew ne karê te ye,û kes jihewe çu livîna ü dengî nekit,heker hün hemü dê êne êşandin..Û her demê parên me gehiştin, em dê bû hewe carekadî zifirînin..**

**- Hün wî jivê jorê dernaêxin,heta hün me her sêya ne kujin..**

**- Ew gelek bisanahî ye..**

**Binav êk ketin wek gurgên har,ew hevalên dijorên birex ve jî litana wan hatin û barê wan sivik kirin.Bişeq û mista ji jora xwe kirine der.heta ser cadê lidüv çûn.**

**Em dê her zifirin.. Ma tû dê kîve ji ber me qurtal bî..?!**

**Lêk kum bûn dijora xweve,birînên xwe jixwînê paqij kirin,kes nema xwîn jê ne hatî...!**

**- Gelî bira..Ez daxwaza lê bürînê dikim,û ez gelek supasîya hewe dikim.birastî hewe ez jimirinê rizgar kirim...!**

**- Pêtivî supasyê nîne..**

**- Te çi libere?Dê çi kî piştî cihê te zanîn?**

**- Divêt carekadî likuneka dî bigerm,ev cihe jî dîyar bû,divêt dîsan xwe berze kim,navê xwe bigihorim..**

**- Bextê teda,weneke,em wek birane,em dê xwe gurî te kin, kes neşêt destê xwe bikite te hindî tû livêrê bî..**

**- Erê raste,dibit licihê tû bicyê kes nebit berevanyê jite bikit..**

**- Heta kengî hün dê berevanyê jimin kin...?!Heta kengî ez dê xudan zêrevan bim,û dê ji jiyana xwe tirsim..?!**

**Roja wan biwan suhbeta ve bûrî.bişev lêk kum bûn ü gelek sehbet axiftin hatin kirin.Lê kesê neşîya çu çara bikit.Pare gelekin,xudan dibêhn tengin..**

**Hevalên wî biwan xem ü kula ve nivîstin...**

**Liber dergehê jorê,liser milê xwe zifirî,hevalên wî dixeweka kür danin,hêşta bêhna xwînê jiseruçavên wan zuha nebûye.Divîya xwe pavête ser kelexê wan,divîya kitkte biçite serê wan,divîya xatira xwe jiwan bixwazit.Lê ditirsîya rê lê bigirin,ditirsîya pirsîyara qunaxa bêt bikin..**

**Biçavên pir rondik.çantê xwe havête milê xwe û didilda xatira xwe jihersêya xwast û derket.wek rojên eskerîya giran lidemê qesta berahîya şerî dikirin,zifirîn neya misuger bû....!**

**Xew dayikeka dilsoze,gelek cara liber sîngê wê ü dinav kirasê wê da,xemên giran diêne jibîr kirin,diçine govend û suhbeta wê..**

**Xewê jî gelek cara baca xwe divêt,û baca xewa wan gelek dijware,jiber giranîya barê wan,ü giranîya xemên wan,xewinên dirinde dibine mêvanên wan,wê xewê jî lê dikine jehr..**

**Her çendekê cilfek biêkî dikevit ü hişîyar dibit,lê hindî xew liber dilê wan ya bitame.nevên çu çar jê hişîyar bin...**

**- Azad.. Aso..Hilûn, saman nedîyare...?!**

**Licihê saman gerîyan,zanîn vê carê jî pîstê xwe guhart,vê carê jî bû mişextê warekê ne dîyar.**

**- Hün çi dibêjin?Dê kîve çit?**

**- Hindî wî pê çê bit,dê xwe veşêrt..**

**- Nê çu cih neman,çu welat kesê wernagirin.**

**- Bû demekê kurt,dê şêt xwe xudan kit..!**

**Rêyaqaçax,xerîbî,dürketin,westîyan,şer,kujtin,enfal talan, sotina gonda,welat,dayik ü bab.....**

**Hemü wek fîlmekê tumarkirî lipêş çavên wan xweya dikir...**

**Her sê wek girtyên qeyd bipê,hişik ü bê gîyan dihizra da man xendqî..**

**Dengê dergehî wek birîyara liêbürînê,her sê jiwê ezabê rizgar kirin:**

**- Telefun..Kak azad telefune,bû te jiKurdistanê..**

**Hersê ya pêkve kirine hewar..**

**- Xêre, înşala xêre...!**

**Azad rê nedît,nezanî çewa jijora xwe derket,nezanî çewa gehişte cihê telefunê..**

**Telefun ya liber dergehê serekî yê kempê,êk telefun gelek mirovin.hemü yên lihîvîya wê telefunê,carekê dengê mala wan bigehite gohên wan,ew telefun bû hemüyan wek perstgeheka pîroze.**

**- Helo,helo,ez azadim..Tû kî..?!**

**- Ez Mamê teme.. Tû çewanî, başî..?!**

*******

**"– tû dizanî çu kes ü çu tişt linik min jivê kiçê şirîn tir ü xweştivî tir nînin?!Ev kiçe min ya bû xwe xodan kirî.ez pitir jiher tiştekî hez jê dikim.Pitir jigîyanê xwe.vêca bizane,eve min gîyanê xwe kire didest teda!Divêt tû baş biparêzî.**

**Ev kiçe min da te,ü êmane tû û ew,baş bizane ez jite razî nabim,heker ew jiterazî nebit"**

*******

**- helo, helo, azad**

**Belê,Mam min guh lite heye..**

**- Tû çi dikî..?Bû na zifirî?!**

**- Ez neşêm bizifirim?**

**- Jiber çi?Tû lihîvîya çî?Ne te kare,ne pasport,ü ne paşeroje, te xwe liçi girtî ye?!**

**- Ji ber wan egera ez neşêm bizifirim..**

**- Were bizifire,welat xweşe,tenaye dê baştir xwe xodan kî, biçükên te pêtivî tene....!**

**- Ez neşêm biçükên xwe xodan kim,ez yê nesaxim.**

**- Nesaxî...?!**

**- Erê,ez pêtivî derman û dixitura me,da bijîm.**

**- Dixitor û derman livara jî yên heyin.**

**- Derdê min liwelatî derman nabit,ez yê tûşî nexoşîyeka dirinde bûyim,divêt her çend rojeka kuntirola xwe bikim,û dermana bigihurim,ev tişte liwelatî nîne..!**

**- Ma heta kengî em dê lihîvîya te bin?!Ma heta kengî em dê direwa libiçükên te kin?!**

**- Rastyê bû wan bêjin.bêjinê babê hewe yê mirî,hewe çu bab nînin,bila bê hîvî bin....!**

**- Û jina te..?Ew dê heta kengî divî ezabê da bit..?!**

**- Ew jî bisanahîye,bila bêt da wê jî bê hîvî kim!**

**- Ew çi gûtine?Ma tû şerm jixwe nakî....?**

**- Ew rastîye,min çu tiştê dî pê çê nabit.**

**- Van suhbeta neke,were bizifire,bila tû dinav mirovên xwe da bimirî,bûte gelek baştire.**

**- Ew hîvîya mine,lê gelek zehmete.**

**- Ji jiyana xwe netirse,ez dê te û biçükên te xodan kim.Eve çend sale ez yê wan xodan dikim,tû jî were ez dê tejî xodan kim,hün hemü biçükên minin....!**

**- Piştî çend sala xerîbî,jinü bizifirim ü tû min xodan kî?Birastî eve bixwe mirineka dîye...!**

**- Bû mirine..?!Ma kes xelet nabit?Ma kes xusaret nabit?Ma bela na êne serê kesê?Ma jixwene ez bîyanî me?Ez babê jina teme,her wekü babê te...!**

**- Erê weye,lê dê çi bêjime xelkî?Dê çewa serê xwe linav Hevala bilind kim?**

**- Evan tişta jibîr bike,kesê ageh ji te nîne,û kes neşêt mayê xwe dijiyana te bikit.**

**- Bawer ke min bihayê nanekê nîne,ma dê çewa zifirim?**

**- Ka bêje te çend pare divên?Ez dê bû te hinêrim,karê xwe bike û bizifire,bese bes..Te em şêt kirin.Û wek min gûtî,xema jiyanê û para ne xo,ez dê bû te para hinêrim da tû pê bizifirî.**

**- Ez dê hizra xwe kim..**

**- Çu hizir kirin pê nevêt,divêt tû her bizifirî..**

***

**Ew demekê dirêj bû,şev bibûn yar,didanga wê da gelek seyran dikirin,dina pilên wê da gelek nihênî diveşartin,gelek xeletyên xwe bin ax dikirin.**

**Carekadî şev lê neyar hat,careka dî,tarîya wê bû perdeka reş,çav lê tarî kirin,rê lê berze kirin.**

**"- bizifire.. Divêt tû bizifirî..**

**- Dê çi bêjime hevala..?"**

**Liser vê teniştê bû ya dî,dinav nivîna sar da kun û qulaç têkvedan,xew nedît.**

**"- tû mirovekê gelek zîrekî..**

**Paşe rojeka geş ya lipêşîya te.."**

**Cihê wî leşê wî xodan nakit.hevdijî dinavbera nivîna wî û leşî yê xav her ya dijwar dibit.**

**"- tû neşêy çu kara bikî,tinê mirin bû te fere..**

**- tû û kar, kar û tû..?**

**Tû wek say.ne ne.se gelek ji te baştirin..!"**

**Nivîna wî tijî agir bû,xwe dinavda ne digirt,rast rabû ser pîya. çend firek liavê dan,dinîva jora xwe da hat û çû,lê jitirsa xew jê sil bit,carekadî cihê xwe dinav nivîna da kir.**

**Çavên xwe danane ser êk ü şidandin,hizir û xem gelek jişidandina çava dijwar tir bûn.**

**"- çu hizir pê nevêt,divêt tû bizifirî..**

**- ez dê te xodan kim...Ez dê te xodan kim,wek biçükên te.."**

**Dengê mîrzo diserîda deng vedida..**

**"- gelî gondîya,ji evro ü pêda,em xema çu tişta na xon,dê kurê gondî azad,azadê gelek zîrek û şareza.dê hemü karên me bicih înit,her xemeka gondî hebit,ew dê çareser kit.Dê bû kurên gondî kara bînit,dê rêya gondî qîr kit,dê mizgevtê înte gondî,dê xwandingehê înte gondî..**

**Babê wî axivtina mîrzo birî ü got:**

**- dê kahrebê divan roja da bû gondî kêşit."**

**Dibû dest qotan ü tlîlyên kiçên gondî..**

**Lê hindî bêhna xwe çik kir,çu deng ne gehişte gohên wî. serê xwe bilind kir,kes lidur xwe nedît,tinê dengê qutana derî tijî jora wan bû..**

**- Vekin..Em polîsin.**

**Hêşta kes jihersêya jinav cihê xwe derneketî,dergeh jibin kirin û hildane jor.**

**- kes ne livit..Nasnamên xwe dîyarikin..Kî jihewe memoye?**

**Her sê man mendehuş,xew ü tirs têkel bûn,welatê wan û polîsên rijêmê hatin bîra wan.**

**- Ez memo me..Hewe çi divêt?**

**- Em polîsin,karê xwe bike da digel me bêy..**

**Memo zanî çi serubere,lê hevalên wî pirsîyar kirin Em dişên bizanin jiber çi dê memo girin..?!**

**- Erê..Heker wî bivêt hün bizanin..!**

**Memo xwe tênegehand**

**- ez jî nizanim jiber çîye?Min jî divêt bizanim..?**

**- tû berî salekê yê jiîtalîya hatî,û te liîtalîya daxwaza penaberyê kirîye,nabit liçu welatên dî vê daxwazyê bikî. divêt tû bizifirîye îtalîya...!**

**Milên memo girtin,kirine dinîva xwe da û beref derê birin.**

**Liber derî liser milê xwe zifirî,Bixatira hewe,dibit em êdî êk nebînin,lê min jidil bîyar da,ez bizifirim welatî..!**

**Aso xwe havêtê ü da bersîngê xwe...**

**- Ez jî belênê didim bizütirîn dem bizifirim.**

**Devê memo tijî kenî bû..**

**- Em dê êk liwelatî bînin,lê her dê mînin heval.**

**- Erê..Her dê mînin heval,her kes û bîrubawerîya xwe.**

**Azad neşîya xwe bigirt,herdû dane ber sîngê xwe û jidil girîyan..**

**Girîya wan serinca polîsa kêşan,xwe jikuma wan dür kirin, çend çirkeyek dane wan da bidilê xwe digel êk baxivin.**

**- Bixatira hewe,hîvî ye kak azad ez te jî liwelatî bibînim.**

**- Erê wek heval û bira,ne wek hevdij..**

**Jor bê deng bû,her dû man bibanê hizirên xweve hilawisitî. neşîyan liser cihên xwe rünin,neşîyan liberamberî êk rawestin,çu gotin jikesê nehat,man diwî seruberî da.dergeh carekadî hate qutan.**

**- Xêr bû? Ewan polîsa çi divîya?**

**Wan hevalên birex jora wanve ditana wan hatin.**

**Livî welatî,kes neşêt çu harîkaryê bû hevalê xwe bikit,ji ber giranîya barê wî.**

**Aso diagirê hizirên xweda dikelîya,neşîya xwe liçu ciha bigirt,her suhbeta hevala germ dibû,her xoha leşê wî zêde dibû..**

**- Eve rêya me hemüya ne,divêt em birîyareka mêrane bidin..**

**- Erê,em çi dikin livan welata?Ewê heta nihu ne hatîye wergirtin,yan ewê kaxezên wî jê standîn,çi dikin livan welata?Bila bizifirin,em bû nazifirin?Em lihîvîya çine?!**

**Aso liser milê xwe zifirî**

**- em yên lihîvyê ew destên me qeyd bikin bizorî me bikine derê..**

**- Ew roj ne dürin..**

**- Ez nahêlim ew roj bêt,ez dê divan roja da karê xwe kim û zifirim....**

**(17)**

**Ew jora eve demekê dirêj,bibû mala wî.ew jora hemü demê xwe têda dibûrand.bişev piştrast dinivîst,bixweşî ü nexweşî digel hevalên xwe dijiya...**

**Ew jor nihu ya tijî mêvanên bîyanî bûy.**

**Cihê memo, kabirayekê sirîlankî ye.cihê saman,kurekê efirîqî ye.û lichê aso,pîremêrekê evganîye...**

**Çu peywendî dinav bera wan danîne,neşên bisanahî pêkve bijîn.Her êk jiwelatekî ü jidurhêlekî.her êk wek xwe dijît.kesê ageh jixema kesê nîne.xwarina wan cudaye. rüniştina wan cudaye.suhbetên wan dicudane.**

**Barê azad girintir lê hat.xemên wî zêde bûn.kes nîne gazinda bû bikit.Wan çend demjimêrên dijorve dibit. binivistinêve dibûrînit.lê heker xewa wî kabirayê efirîqî nehat?!Heker wî vîya gohê xwe bidite stiraneka dayika xwe?**

**Heker pîremêrê evganî vîya qoranê bixwînit?Yan wî kurtulazê sirîlankî vîya gohê xwe bidite stiraneka welatê xwe?**

**Dê çewa azad nivit...?!**

**Dê çewa şêt derdê xwe bû wan bêjit?Her roj liber çavên wî reş dibin.her şev liber dilê wî giran dibin.her bêhna wî teng dibit.her kuxka wî dijurar dibit.**

**- Nexoşîyeka mezin ya lite..Divêt tû lijora me nemînî..**

**- Eve jora mine,heker hewe divêt hün dişên pirsîyara joreka dî bikin...?**

**- Nexêr..Em sê ne, ü tû êkî.divêt tû pirsîyara joreka dî bikî, yan biçîye xestê..?**

**Dinavbera wan da,roj bû rojê nexweş dibit.Eve demeke çu telefun jiwelatî nehatîne..!**

**"- erê wan ez jibîr kirîme? Eve xêre?!"**

**Telefuna giştî,ewa liber derê kemipê,eve demekê dirêje ya şkesitî û kes çê nakit,eve çend cara çê kirin,lê serxoşên kempê carekadî jikerba xemên xwe da dişkênineve.**

**Peywendî neman,çu rê nînin,tinê ew telefun bû,nihu ew jî kar nakit..**

**Her barê wî giran dibit,hîvîya wî berze dibit,bêhna wî teng dibit,çavên wî tarî dibin.**

**Diwê gêleşuka jiyanê da,kete nav zifirokeka dijwar da, gelek cara bin av dibit.gelek cara dikete nav agira.**

**difirî.. Dikete bin pîya..Dibû gurgekê har,biçükên xwe didane ber leqa..Yarî bigoştê leşê wan dikir.**

**Car jî dest û pên wî bizincîra diqeydkirî bûn.livîn jê ne dihat. bidû çavên zil,destê jina xwe dinav destê kabirayekê bîyanî da didît.yarî bipaxlên wê dikirin.xwe dinav kezyên wêda diveşart.wek dû pelatînka yarî dikirin...!**

**Her dû kurên wî,licada bajêrî,bûyaxçyên pêlava bûn,cigar firoş bûn,bişev cih nebû lê binivin.qesta mizgevtê dikirin...**

**Her xoha leşê wî zêde dibû,her kenîya jina wî dinav destên wî kabiray da bilind dibû.her biçükên wî birsî dinivîstin.**

**Xoh zêde bû,kenî bilind bû,heta gehiştîye hevirkîyeka dijwar. hemü hest hatin sotin.**

**Bû cara dawîyê berevanî jigîyanê xwe kir,jiwê hevirkîya dijwar,hate ser Dijwarîya jiyanê.çavên xwe vekirin.dû sê kiçên ciwan yên lihndav serê wî.bibişkurîneka şirîn bersiva mendehuşîya wî dan.**

**Sipêde baş,silametîye,keyiva me hat tû hişîya bûy.**

**- ....**

**- Tû yê birsî?Yê têhinê?**

**-....**

**- Te tiştek divêt?**

**- Ez likîve me?**

**- Eve pirsîyareka ciwane!Tû yê lixestê..!**

**- Bû..?Çi limin hatî ye?**

**- Çi ne.Divêt tû bêhna xwe bidî,tû gelek yê westîyay.**

**- Ha..?!Hün jinü pêhesîyan?Eve şeş sale ez yê westîyay..!**

**- Belê..Te çi gût?**

**- Çine.. Çine..**

**- Te negûte me?Dê çi xûy?**

**- Min divêt telefuna mala xwe bikim.**

**- Bila..Lê piştî xwarnê.**

**Dû sê dixtor,digel dû sê harîkarên wan,û dû sê**

**Kes jirêxiraweka mirovayetyê.Lihndav serê wî dirawestîyayne.**

**Wek mendehuşa berê xwe dida nav çavên wan,dizanî eve ne hatîne seredana wî,dizanê eve hemü jibû karekî ne siroştî hatîne,dibit jibû xatirxwastina dawîyê bit?!**

**- Bibüre,me gelek pêkul kir da peywendiyê bimala te bikin, lê cihê daxêye me neşîya,û te çu nav ü nîşan û telefunên çu kesa liewropa nedane me,em peywendiyê pê bikin, vêca em neçar bûn vê peyama nexoş ü dil tezîn êkser bigehînine te...!**

**- Peyameka gelek girane,lê em bawerin tû mirovekê xudan îmanî ü bihêzî.dê lime bûrî..!**

**- Bêje dixitur,ez jimêje lihîvîya wê peyamê me,ez jimêje lihîvîya mirinê me,ez jimêje yê mirîm...!**

**- Peyam eve ye..Jiyê te kêmtir jisê heyiva maye.ü em bawernakin tû pitir jisê heyiva bijî,ü cihê daxê ye,zanist neşîya çu çara bikit.ewa me kirî çu mifa nebû,ü em neşên pitir bikin.Em jidil daxwaza lêbürînê jite dikin.û her tiştê tû bixwazî divan sê heyivada,em di amadene...**

**- Daxwaza min.ez bizifirim welatê xwe.hîvîye bû min pilêtekê bikirin û min bihnêrine welatê min..**

**Wê pîrejina jirêxirawa mirovayetyê hatî,bidilekî pirkuvan gût:**

**- heker dixtor destüra sefera bidin,em dê te sebehî hinêrine welatê te.**

**- birastî ez bitinê neşêm vê birîyarê bidim.**

**- divêt ez her biçim,bila ez çend rojeka digel biçükên xwe bijîm,paşî mirin bila bixêr bêt..**

**(18)**

**Tijî difina wî bêhna axa welatî bû.müyên leşê wî tîj kirin. xwîna dilê wî kire volkan.**

**Liser lêva tuxîbî.sê çar destên dehul ü zirna,hatîne berahîya wî.çend xelkê gondê wan ü gondên rex ü rûya.liberahîya wî dileyizin.tilîlîya esman kun dikir.xemla kiça evînî har dikir.**

**Serê xwe bilind kir,jidür ala Kurdistanê liser avahîyekî yê bilind bû.**

**Kenî,bişkurî, kuxî..**

**Sê çar tulazeka bilind kire ser milên xwe.**

**"- me jinü zavakir..Me jinü zavakir**

**Kaku azado.. Me jinü zavakir..."**

**Divîya bikite kenî ü bêjit:**

**-Ne ne,ez yê büme zava û wa he bûke**

**Lê hindî govenda wan ya şarîyay bû ü hindî tilîlî û zirna dibilind bûn.ew gûtin man didilî da.**

**Mîrzo yê bixencera babê xwe dileyizit.pismam û kur xal, haha dê serê xwe xon,dûtmam û xüşik yên bûyine teşî.**

**Bira wek sufîyekê dîndar yê dihal çûy.Dayika wî,babê wî**

**Jirêya gorstanê beref kuma wan bidewat ü tlîlî dihatin. muxtar,her çendekê destê xwe dibite paxla xwe û şabaşa didite zirna bêjî.**

**Mamê wî bidemanca xwe ya sitîlî di xurit.dewat beref gondî çû.ewên neşîyayin bêne tuxîbî,hatine berahîya wan lirexê gondî.**

**Gond bibû vîstevaleka hunerî.berê zavay dane mizgevta gondî..**

**- Dê kîve çin?!Min divêt biçime mala me?Dê min kîve bin?! Ew ne rêya mala me ye?!**

**Av ya germe.zava jiser mila înan xwarê.serê wî baş şüştin.**

**- eve çî ye?Ma çi mal nebûn hün serê min lê bişun?**

**Ka Mamê min?Ka pismamên min?Ka muxtar?!Hewe bû limalên wan serê min ne şüşit?!**

**Kesê persiva wî neda...**

**Tilîlî û dengê dehul zirnayê her yê bilind dibit.**

**"-me jinü zavakir..Me jinü zavakir**

**Kaku azado.. Me jinü zaakir..."**

**Carekadî zava danane ser milên xwe û bidestqutan ü stirana,beref gurstana gondî birin.**

**Dê kîve çin?Ma hün min na bine mala me?Ma ez ne zavame?Dê min bibine ser cihê min..!**

**Dayika wî bersiv da:**

**- dê bîye mêvanê min,û yê babê xwe.Ma te nevêt lime bibîye mêvan?**

**Lipişt xwe zifirî,jina wî nedîyare,biçükên wî yên dinav destên hindek jinka da digirîn.**

**Hindî kire hewar,hindî vîya xwe jiser milên wan tulaza pavête xwar.**

**neşîya,linav goristanê,dîlan germ bû.her çendekê tulazek dileyizî,û êkê dî stiran digûtin.**

**Liser milê xwe zifirî,gondê wan yê mezin bûy.cade ya bûye qîr.xwêndingeh,ya avaye,mizgefit ya hey,dartêlên kahirebê tijî kulanane..**

**Zanî mîrzo rast digût:**

**"-hey lû, hey lû lawkê gondî.."**

**Digermatîya dîlana wan da,xwe dirêj kire dinîva dayik û babên xweda.divîya binivit,lê gondîya hemüya karê xatirxwastinê kirin.**

**Melay xatira xwe jê xwas,mixtarî pişta xwe dayê.kes nema lihindav serî,tinê dayika wî û babê wî.divîya gazî gondîya bikit,lê kesê goh lê nebû.divîya bikite hewar.çü deng jê nehat.divîya rabite ser xwe,û qesta gondî bikit...**

**enîya wî biwî helanê liser sîngê wî ket...!**

**zanî mêvanê dayik ü babê xwe ye...!**

**23–12–-2004 destnivês bidwî hat "nürnbêrg"**

**5–2–-2005 bû cara dawîyê liser kumputerî hate nivêsîn "nürnbêrg"**